FEQÎR AHMED

# DÎWANA REŞ

# I

Weşanên Kurdistan - Kurdistan Verlag

Bestelladresse:
Weşanên Kurdistan -
Kurdistan Verlag
Wachsbleiche 62
D-4500 Osnabrück
©1990

FEQÎR AHMED

# DÎWANA REŞ

# I

Weşanên Kurdistan - Kurdistan Verlag

JI BO
GELÊ KURDISTAN

# PÊŞGOTIN

Çewa her afirandin eynik û biriqîna ew mirov e, kû wê afirandinê dîxulqîne, ev afirandina destê we jî biriqîna Feqîr e weka kû ez wî ji zû ve bi şexs dinasim. Feqîr bi vê afirandina xwe mafên şexsî û zomî di nav mafên gelê Kurdistan de helandiye, mafên gel yên giştî girtiye pêş û nêzîkiya xwe bi dilovanî honandiye, daye ber çav kû ew bi rastî welatparêzê Kurdistan û ji helbestvanekî girîngê Kurdistan e.

Bi avakirina vê afirandina xwe li gel pirsgirêk û hukmê giranbiha di nav gelê Kurdistan, bi taybetî gerek bo xatir û qûdreta ronakbîrên fêodal, yên kû rûmetên gelê Kurdistan bi dilxirabî pêş dikin û xwe pêşverû-welatparêz bi gelê Kurdistan didin nasîn, li ser qîmetên kû ne mafê wan e têtin rûniştandin, li gel neyîniya ev tişt bo gelê Kurdistan bi dilşewatî anîna ziman, perçebûna gelê Kurdistan ya fêodalî nexweştirîn aliyê gelê Kurdistan pêşçav xistin, ewên kû feyde ji vê rewşê dibînin û li mafên xwe yên şexsî digerin, çi bi bingeha baweriya olî, çi bi hebûna qudreta bingeha eşîrî dijminê wanê bê aşitî ye. Ew dide zanîn kû ewan bi serdestan re xwediyê mafekî ne, li heremên Kurdistan, ew destdirêjên mafên dijminên kolonyalîst li herem in; ji ber vê yekê jî bi karînên kirêt gelê Kurdistan her tim di zorîna êşejiyan kişandinê de hîştine. Ev fêodalên destlîzoka dijmin û hevalbendên wan ev cahş û sîxur yên rûreşên gelê Kurdistan ji bo mafên xwe yên rojane xwesbûna wan bi bê şerefî dihonîne û ji bo eşkere kirina wan di nav gel de çi ji destên wî tên paş ve nahêle.

Ji vî ketibe, bi xemgînî diyar dike kû rûmeta rewşenbîr û welatparêzên, kû xwedî li qîmetên gelê Kurdistan derdikevin, kêm tê danîn, kêmaniya biriqandin û nasîna wan li nav gel, ji hebûna kêmasî û têrnekirina îmkanan, kêm tê cî, ji ber vê yekê jî divêtiya pêşkêşkirina pêşengên têkoşîna serxwebûn, nasandina li dijî kolonyalîstan, dilgerm durust antî-fêodal bi rûmet ji bo pêşerojên Kurdistan bi qîmet û rûmeta rastîn bên cî kirin, dide zanîn.

Ev afirandin ji bo gelê Kurdistan ne tenê bi aliyê welatparêzî, lê ji aliyê pirsên demane yên gelê Kurdistan dihonîne jî girîng e, ewqas jî weka kû, ji aliyê ziman jî girîng e, wekî din afirandinek ji gelê Kurdistan re ji gelek aliyan giranbiha ye.

Ez di wê baweriyê de me, ev afirandin, kû di nav qîmetên gelê Kurdistan de ye, wê di pêvejokê de ji aliyê gel giranbiha bê dîtin û ciyê xwe yê pêwîst bigire.

*E. XEMGÎN*

NAVROK

Axina min Kurdistan.......................1
Xwe li te bigerînim......................13
Ey Şahlûlê min...........................14
Sond bi avstan...........................17
Çand û dîrok.............................18
Lewca Azadî .............................23
Hebûna Kurdistan.........................24
Bibin hostê gelê xwe.....................28
Li Helebce...............................33
Nama Kurdistan...........................35
Ji Dijminra Goristan.....................38
Ez û Bilbil..............................39
Ala Rengîn...............................41
Apê Gedûr................................43
Te ez rizgar nekirim.....................45
Pişta min jikest.........................47
Karkirno werin em herin..................50
Welat....................................51
Hevalê rêça min..........................52
Şewat û nalîn............................54
Berbang..................................55
Xortê Kurd...............................56
Evîna bê hêvî............................62
Deşta Berazan............................63
Ey Mileto................................68
Derîya Evîne.............................69
Ez kurmamê teme..........................70
Memostan Cigerxwûn.......................71
Baxçe Gulan..............................74
Hevalen Cefakar..........................76
Jîna min kete devê guran.................78
Gele hêja................................79
Silav ji bavo ra.........................81
Gele Kurdistan de rabin..................83
Emine....................................86
Serketin û Bilindî.......................87
Va Axe xayîn.............................88
Belengazên Kurdistan.....................90
Çel û Çar................................92

Dilê min.........................95
Sitêr...........................97
Evîna bê ol.....................98
Sistem bû a gundî û karkir......99
Rakin Ala Cengê................100
Barê Welat.....................101
Govend.........................102
Lêva sor.......................103
Şîna Welat.....................105
Evîn...........................110
Ey karkirên Kurdistan..........112
Tazî û Birçîyan................113
Dayîk..........................114
Pirozkin.......................115
Sebe Kurdistan.................116
Şevreşî........................117
Jîna însanan...................121
Nuh-roj........................123
Yekî Gulan.....................125
Dev-kên û Zik-dir..............126
Sîtil dikelê, sîtil............128
Iro li Kurdistana me...........131
Hêz dikim......................133
Ji min sitandin................134
Para gelî te tuneye............135
Berdin bi hêz serî hildin......137
Ax pişta min...................140
Bêşîkçî........................141
Huniran bidin min..............143
Roja sor da kurd hene..........147
Tev hilweşandin................148
Dilê bi kul....................150
Axan çikir.....................152
Menalin........................154
Axan û began...................155
Koledare qebûl nakin...........156
Şoreşgerê Qehreman.............157
Ezim Kurdistan.................159
Kurdno.........................164
Şîyarbûn.......................166
Mujûlim........................167
Hişîyarî.......................168
Qata bindest...................170
Şewitandin.....................171

Welatê me Kurdan........................173
Gelî rakir çakûç û das..................174
Herdu hostê li Cîhan....................175
Evîna karkir............................177
Keça berazan............................179
Min heval naskirin......................180
Hevalan sir neda dijmin.................182
Belengazîya Filistîn....................183
Hêja û zana.............................185
Çûme levan..............................188
Sîngê bi pirç...........................190
Cejna Kurdistan.........................192
Partîya.................................193
Xeml û xez..............................194
Şermê gelê Kurdistan....................195
Xêr û bêra Kurdistan....................197

## AXINA MIN KURDISTAN

Ax tijêye
Xwûn, dibarê, tirs û xofa li varan
Çiyan û zinar deng dane hev dinalin
Şeve reşe hirç û hovan di kalin

Pûk, baran, berf serma û bayê kur
Li min dibû gêjgerîng û serma pir
Ez xwe bavêm ber qefakî ku nemrim
Rêç windakir berîyê xwe da bayê kur

Kete pêş min darê hûr û wergi pir
Dişemitîm çalî ketin linge min

Bi ve tirsê bi ve xofe bi vî havî
Li xwe xist û got haho dayîka min

Hêza xwe kir ji ber piştê ranabim
Çalîyan derxim ji xwûnê xelas nabim

Xwûna min bîn da wa hovana kir zûrîn
Çeqel û rûvî kê tev buxwun laşê min

Ez bi lepan li ser kûnê pêşva çûm
Avjinîyê nizam min got haho fetisîm
Pêşa min boş bû diketime deriya kûr
Dayik di-hat bîrîya min'jî lepitîm

Ez derketim kenara derya mezin
Canê min, hiş û serî li min gejbûn
Li we derê di fertilim bi wî halî
Pirça serî li min mezin û direj bûn

Ez bi tenkê li we çolê li vî banî
Birçî dibûm diçûm çolê ku çi hanî

Bi mehan û pir bi rojan mame li wir
Derketim ser darê dareke pir bilind

Hatê xanê deştek mezin bajar gund
Ji ser darê hatim erdê pêşva çûm

Di meşîyam pir dirivîyam çiqas dûr
Bi wî halî bi ve rezalî ez reben

Ez tazîme nikam herim nav şênî
Xwe bavême xanî kevn û xirabe

Têda hebin kincê qetîya û kevnar
Li xwe deyînim ku herim nav şênî

Ez derktim ser xirabê reş û pehn
Hate xanê derî reş û pir mezin

Pir pêlepûç ez daketim diçûm jêr
Dengek hate guhê min go were vir

Ez zivîrim li ser mila xwe çepê
Derî vekir çi karkêr û gundê pir

Didane min şal, şapik, nan û goşt
gotin hatî li ser çavan tijî xort

Wana gotin bi xwandinê dizanî
Em bûxwûnin pirtûka ser firazî

Pir memostan roj û şevan didan min
Ez dibûme xwandewanê poz bilind

Didan dest min pirtûkeke pir mezin
Min dixwand û pire xweş û pir mizmiz

Pirsîn kir û wa hevalan ji mira got
Min xwandindikir heta sibê wexta cot

Şev û rojan we pirtûkê dixwûnin
Ku radikevim li ser diljî datînim

Hevalan go em kê pirtûk bixwûnin
Kolan rakin tev li koledar xînin

Guh dar kirin yekî jîr, zana û xurt
Xwandin dikir kesan nekir qirte pirt

Belengazan dest dane hev tev meşiyan
Mal û qesrên dewlemendîyan hilweşîyan

Kirin dest xwe qesir, qonax, birc û lat
Ko xelas bû şefaq lê ket û roj hilat

Çend keser ji dilê min'da hatin xwar
Qîrîn bi min ket ka û ka welat

Ez rakirim ser doşegan û bê guman
Heval li nav çiyê xwe radimedîyan

Ez diketim pir ramanîyan û xewûna kûr
Derket pêş min rêçek mezin pir li dûr

Na xewînê gund, şênî û tev bajar
Diçim diçim deng, qîrîn û hawar
Dema salê çîye ne havîn û ne bihar

Derket pêş min zinarek
li ber veketîyê marek
gavek duduyan pêşva çûm
Ji çîya derket siwarek

Hespa siwêr pir başbû
Dilê min ji mar nexweşbû
Dengê zengûyan û nelan
Mar rabû bilind dibû

Erd û ezman tev şaqiya
Siwar li hespê leqiya
Ejdirha serî rakir
Zinar ji erde teqîya

Tirs û xofa pir mezin
Tev'da kete dilê min
Bû pûk, berf û baran
Siwar û mar lihev gerîyan

Min go mar dijminê min
Siwêr buxwe werê min

Min li lingan kire qîrîn
Lê ez çito birivim

Pir rivîyam û min bankir
Xwe ji xewa şevwn çekir

Heval hatin dora min
Tev dixwasitim şora min

Werhasilî min xewûn got
Heta sibê dema cot

Heval rabûn xeyîdîn
Çav sor dibûn çemidîn

Gotin em neketin xew
Lê xewûna te tev derew

Demek dirêj mam li wir
Kesî negot tu ji kur

Pir lepitîm û xebitîm
Rojek lingê min şemitî

Hêta mine tevre gir
Du paranbû li ser kêvir

Kalek hanîn girêdan
Ez diketim navê cîyan

Di hindirda tenkê mam
Nikam vexum ava sar

Roj bûne meh meh bûn sal
Derketim ji navê çìyan

Bi salan û şeş mehan
Rihet dibûm digeriyam

Heval diçûn xebatê
Meh jî serî sebatê

Bû baran, pûk û berf
Heval hatin gîştine hev

Ez dişandim nan û goşt
Yekî rabû şorek got

Tu here çarşîya mezin
Li pîê çepe bi fertil

Dûkaneke pire gir
Derî veke her hindir
Tu pirs bike kalê şor
Ewe bi tera bike şor

Ew bê xort çi dixwazî
Tu bixwaz pirtûka mor

Dirav pêde û bisztîne
Wî tiştî zû bi me gîne

Ez diçûme nav bajêr
Ziqaqeke pir mezin
Lê nihêrî û çiqas xeweş
Şênî, têda digerîyan

Di sekînîm û xeniqîm
Hesîr ji çavê min şemitîn
Yekî go tu megirî xort
Min nihêr yekî kal

Ew bajarê pir delal
Di navda şênî digerîya

Kalê go tu werî vir
Rûne birazê li hindir

Kuva têyî û tu darîye
Ew welatê te kêrêye

Min go kalo biserê te
Nasnakim welatê xwe

Kal xeyîdî û çav sor bûn
Pirça serî lê gij bûn

Pirsîn hate devê wî
Go birazê ne wanî

Heta tu xwe nas nekî
Tuyê bigerê tim wanî

Zor da min û xeyîdî
Çito tu xwe nasnakî

Min go kalo pir bi dizî
Welatê min ji min dizîn
Kal kenîya û kêf xeş bû
Rûçik li kalê geş bû

Kalê go guh bidî min
Tev'da wekî te kurdan
Nas nakin welatê xwe
Nexastin xwe nas bikin

Kurdan hemûyan wekî te
Nexastin welatê xwe

Bi derew û bi qerêşîyan
Tev dibûn dijminê hev

Kalê derxist ew pirtûka
Dirêj kir û dida min

Winda meke tu vê pirtûkê buxwûne
Kurdistana delal di nav'da bibîne

Min sipas kir ji dukanê derketim
Nan, goşt û fîkî kirî bi rê ketim

Ez dihgîştim nav heval û hogiran
Nan û fîkî min danî peşîya biran

Pirsîn kirin ka pirtûka me gotî
Diçûm wêre ew pirtûka min hanî

Ew pirtûka qenc, baş û pir delal
Çap kirine nifisîya we pir delal

Min go eze vê pirtûke buxwûnim
Pirs kirina kalê di navda bibînim

Şev û rojan li ser pirtûk xebitîm
Pir welatên bin dest hebûn filitîn

Hêze xwe kir bankir hemû hevalan
Heval hatin tev sekinîn guh dar bûn
Ez dikê herim welatê xwe bibînim
Gelîyê meyî pir bin dest û perîşan

Gotin here Welatê xwe bibîne
Belengaz û karkeran bi hevdigîne
Xebat bikin bi sedan û hezaran
Şaşe mekin rêça karkêr bibînine

Min xatir xast hêsir ji çavan daketin
Diçûm diçûm di çend mehanda gîştim mal

Kalê bavê pîreka dê û gelê gund
Li dora min digîştin hev wekî kund

Me maç dikirin dest, enî û çavên hev
Kalê bavê û pîreka dê bi min bawer

Rojek duduyan di hindirda neçûm der
Roja sisîyan rabûm diçûm qehwa gir

Rûdiniştim li ber derê qehwa gir
Gelek xortan zar û xumar dilîstin

Xorto hatto û xast qehwe dida min
Firtek dudu min qehwa reş wexwar

Serî rakir dora xwe jî çav gerand
Di koşeda sê xort hebûn pir cîwan
Ne dilîştin tu xumar tistên û zar

Ez radibûm diçûm cem wa xortên jîr
Şûn dane min çiqas qenc û tev wezîr
Pir peyivîn pirs û ber sif me da hev
deste hev girt tev daketin çarşiya gir

Delal derket li nav bajêr bandike
Fîlim hatîye tev gelan hişîyar dikê
Bilêd girtin em tev diçûn şîneme
Şeve reşbû hindir dikir hume meşîne

Bexte meyî pir sipî û pirî xweş
Fîlim dibû wek we şoreşa oqtober
karkêr gundî dest dane hev dimeşîyan
Mal û gundên dewlemendan hilwaşîyan

Das û balîyoz kirin dest xwe tev rabûn
Hilweşandin sera û qonax pir bilind

Li ber piyan çû text, taç û warê wan
Hilweşandin dewlemendîya dîn û har

Li ber pîyan çû mal, xeml û xêza pir
Hilweşandin sera û qonax pir bilind

Hevsar kirin dest xwe û tev meşîyan
Sermîyandar, paşa û axan hilweşîyan
Dibû şademanî, şadî, zirne û defa pir
Sistem kete dest karkêr û gelîyê pir

Def û zirne tev lê diketin û bû şadî
Li qûç, qerac, li çîyan û feyîdan ronayî

Tûştê nuh, qenc tev baş çê dikin
Emperiyalist ji cîhanê rakirin

Ne dimîne cîgerxwûn û hostên dîn
Ne belengaz ne feqir û bibin dîn

Ne hêjar ne cîgerxwûn û ne feqîr
Rojek were kû vana bibin hebûn

Va çiroka feqir ji gel'ra wanî got
Ku em nerin wekî berê û dema cot

13.7.1978

## XWE LI TE BIGERÎNIM

Lê ez rojek werim mala bave te
Ji dayîk pirskim şîrîn nave te
Gundî tev komkin civînek çêkim
Bavikê bistînim soze bejina te

Werga qelen bidim defe lêxînim
Siwaran siwar kim hine bişînim
Bixemlînim te kesk, sor û gewr
Dile te û feqîr bi hevdi gînim

Ez rabim ser xwe werime cem te
Xwe bigerînim tev li bejina te
Di mabêne meda tev mij û dûman
Ramûsin lêvê sor xelqe çavê te

Li nave bigerim ko tu nekî şor
Eme evîn darbin alê hildin jor
Bi ser best bijê gele min û te
Azad û rizgar bê kurdistana me

16.11.1972

## EY SAHLULE MIN

Ez çûm sîya dare. Min dî yek li wir.
Bejna we bilind. Rû bi ken û gul.

Min silav lê da. Nego li ser dil.
Ew kete rîya xwe. Da min derd û kul.

Rivîyam li pê we. Go tu veger me.
Afirek da min. Sekinîm li wir.

Min li pê nihêrî. We kire meşîn.
Dile min we bir. Bi xêr û xweşî.

We bir dilê min. Bilbil hat çem min.
Go meraq meke. Lê ew ne sor gul.

Jikênastin dar. Gul tev hatin xwar.
Te ne go ew gul. Jîyana bilbil.

Natirsî ji xwûda. Jikênastin gul.
Ew gul û sosin. Tev da yara min.

Jikênastin sor gul. Tu hatî ser min.
Tu min af bikî. Ey şahlûlê min..

Şahlûl dar danî. Şor li hev hanî.
Li ser telê dar. Ew yara te kanî.

Tu kê çibikê yar. Ko tinebê war.
Ey feqîre min. Here bike kar.

Çi dixwazî ji dil. Derdan bikî kul.
Lê te ranekir. Ew bara ser mil.

Te berda ew yar. Megrî libin dar.
Tu jî wekî min. Boyê evîn-dar.

Navê yara min. Sosin û sor gul.
Nevê yara te. Dibên Kurdistan.

Tu bê war û dîn. Ez tim dikim şîn.
Destan bidî min. Tev bikin qîrin.

Ey şahlûlê min. Verga mebêje.
Sor gul yara te. Tu li ser dikî şîn.

Lê-dan û talan. Tim li bin destan.
Ew xweş yara min. Dibêm Kurdistan.

Ew bi çem û av. Ew bi çîya û şax.
Sor-gul û nêrgiz. Nên hêjmar bilbil.

Tu li ser darê. Tim dikî hawar.
Ew yar birin çûn. Kirin tar û mar.

Tu min nasnakî. Ey şahlûlê min.
Va çiqas sal bû. Diçim li pê yar.

Lê-dan û kuştin. Pê-mal û talan.
Seba yara xwe. Ez bûm dîn û har.

Go tu nakî kar. Yara te bin bar.
Yara min gul bû. Ez hatim ser dar.

Ko tu bikî kar. Xwe bidî bin bar.
Bi tektîk û meş. Belkî bigirî yar.

Ey Şahlûlê min. Ez tim bikim kar.
Heta bi mirine. Naxazim bin bar.

Tu pirske ji min. Armanca te çîye.
Ko tu zana bî. Werî serê çîyê.

Tu bişaq li wir. Eze bankim gund.
Hêzekê çekîm. Ji wa xortê Kurd.

Bikim ceng û şer. Sîng ji bidim ber.
Xebat û lebat. Ko bibim tev-ger.

Bi hêl û hinir. Rabim ji ser xwe.
Tektîk û zana. Bidim gelê xwe.

Bi tang û firok. Herim ser dijmin.
Ji wana bistînim. Lê ew yara xwe.

Ko yar bistînim. Bikim Serxwebûn.
Deyînin sistema. Azadî û hebûn.

Millyaran çê kim. Sor-gul û nêrgiz.
Ez û te bijên. Tev da li Kurdistan.

11.12.1969

## SOND Bİ AVSTAN

Ez Xebat kim roj û şev
Tim gel bikim teve hev
Tev li hinber dijminan
Ko ez bibim serî û dev

Ez û dijmin bikin ceng
Erdê li wan bikim teng
Kokê li dijmin bikolim
Ko li çîhan bidim deng

Sonde duxwum bi avstan
Tev bêm feqîr şoreşwan
Sînge xwe bidim gurlan
Ko rizgarkim Kurdistan

9.2.1988

ÇAND û DIROK

Bese raketin xwe çekin ji xew
Hişar û zanabin em tev wekî dêw
Çekan bikşînin em nola guhderz
Raberkin dijmin tev zanabin ew

Dîroka xwe vekin em lavê kêne
Buxwûnin, bibînin teve ji kêne
Med'ya û guhderz ew rusteme zal
Cihan hizandin em çima nêne

Gelan pir çêkirin çand û ziman
Seba çandiya xwe memostan kirîn
Dijminan dizîn wek çekel û diz
Çandî'ya Kurdan li cihan mezin

Bidine pêşîya xwe ziman û çandî
Alfaba dijmin wekî me hanîni
Ji ecem ji yûnan pirî zimane me
De rabin bigirin lê bibin xwadî

Dîroke mezine mêr hene ji Kurdan
Bixwûnin bibînin şêrên ser çîyan
Peşmerge qehreman cîwan û hejîya
Xwûna wan dirjê bi deste dijminan

Dixwazin çi bikin bibin memostan
Ko raman bibin neben em westîyan
Bixwûnin zanistîye bi zimane xwe
Em hemû rakin ala gelê Kurdistan

Ko zana Nebin nikan herin pêş
Ne xwûnin nebinin qe nabin geş
Dijminan kuştin bav û kalê me
Zanabin, pirskin ew tektîk û meş

Ramanîya dijmin tev kirin nav me
Mihemed hozan bû lê ne sebî me
Dîwanek derxist Kurd kirin macir
Parçe û pêmal bû Kurdistana me

Hozan hene ji me xwe pêşwa nadin
Zerdeştê mezin bîra xwe nayînin
Ew meleyê cizirê bû mirîd û kole
Çe nekir diwanek tev'da ji bo me

Ji dîroke teqîya ew ehmede xane
Hînjî penûska wî guminîya zêr te
Cîgerxwûn goran sipaskin ji wî
Goran û wana hozanin ji bo me

Sirgûn û qîrin doktor bedir-xan
Şehîd bû li deran seba Kurdistan
Ka xazi-mihemed le doktor fuhad
Kete bin lingan gelê Kurdistan

Dîroke vekirîye rê ji mera tîne
Medîya û kawa ma kî nabîne
Nemrute bê hiş rim davêtin jor
Selhedîne ser hişk ma kî nabîne

Dersim li zîlan pir kuştin û mirin
Muhabet li amed pir bi darda kirin
Didane sungîyan keç û bûkên Kurd
Delal û nejla em tev'da jin kirin

Mele rakirin pêşmerge serê çîyan
Bi şaşi ew çû cem dost û biran
Iran ,irak û jon-tirk îmze dan hev
Dixwazin ji cihan rakin Kurdistan

Dîsa rabûn ser xwe hêz û raman
Bane gel kirin gotin em rêzan
Seba serokî hev kirin mît û ajan
Nebûn yekitî li nav gele xizan

Çêkirin partî seba nav û deng
xort kirin robot hevra bikin ceng
Wekî dijminan bi hevdi vedidan
Nav gele nezan da ko ew bibin beg

Dema parçe bûn bi deste axa tîye
Serokî û binokî ji mera hatîyê
Diben serxwebûn û pir dibên azadî
Ne seba Kurdistan axatîya nu hatîye

Xwe firotin dijmin gundî tim kole
Gel ma li ware reş buxwe zirtone
Parçe û pêmal bû gele Kurdistan
Tev rivîyane derva mirin ji bome

Li cihan derbek tev rabin serxwe
Ramanîyake rast tev bidin ber xwe
Ko bibin pola li hin ber dijmin
Koledar derxînin ji welatê xwe

Aborîya welat jîna gel tînê
Ramanîya dijminan rê şaş tînê
Her çar parçan da hêzeke karkir
Sebî welat ji dijminan bistînê

Karkirno megrîn bê welat nabê
Tu nemrî ne kujî pêşve çûn nabê
Ne şer û cengbê tim welat bindest
Petkirina şoreşê bê tektîk nabê

Hişyar û zanbin karkirê Kurdistan
Liskek kete nav loma em westîyan
Xwanda serte şêx, beg, dede û feqir
Derewî sosîyalîstin dibên Kurdistan

19.4.1980

## LEWCA AZADÎ

-----------

Ez û dijmin li vir hin-ber
Amade bûm xwe ber da ser
Min û dijmin sungu hildan
Dijmin rivîya min dida ser

Welat sitand ji dijminan
Ez bûm xwudan xortê cîwan
Li ber ronîya ala-rengîn
Bi hêz û bi qirar meşîyam

Pir xebat kir bi roj û şev
Herçar parçe kirin nav hev
Bi xwûna xortên Kurdistan
Min xwe kirîyê serî û dev

Hidî ez bûm xwudan komar
Tang, top, fiza û bi leşker
Ewê çav berdin warê min
Lê wan ji dinê bikim der

Sond xwarê bi ala-rengîn
Lê feqîr bûm niha zengîn
Ez û gelê dinê bi hev ra
Li Kurdistan şadî û bangîn

9.4.1988

# HEBONA KURDISTAN

Her çar alîyê te dijmin
Cehwer û rind Kurdistan

Çima ketî bin destan
Gewir û şebab Kurdistan

Le zarokê te nabin
Xêr û berî Kurdistan

Tev da mer û zana bin
Hêze xwe kin Kurdistan

Tev da destan bidin hev
Bi hirmijin Kurdistan

Xebat bikin roj û şev
Te xelas kin Kurdistan

Navê te tim bixwûnin
Rind û dirêj Kurdistan

Pir mezin bi nivisînin
Di dinê da Kurdistan

Dijmin werin bibînin
Dewlemendîya Kurdistan

Silawe kê li te deyînin
Her dem bijî Kurdistan

Dijmin destan vegirin
Tu bi hebûnî Kurdistan

Deynekî ji bixwazin
Bira bijî Kurdistan

Ramanîya te pir rind bê
Aborîya te Kurdistan

Ne diktetor feşîst be
Tu giran î Kurdistan

Li nav koma netewan
Bibî serok Kurdistan

Gotin û şora wan gîyan
Bi destê te bê Kurdistan

Civîna Netewan gîyan
Şûn bidî gîyan Kurdistan

Xarî û rastîya wan tev
Maç kin deste Kurdistan

Ewana tev bibînin
Silav bidin Kurdistan

Baxek dudu gulê sor
Beşîkçi din Kurdistan

Werin li cem te razên
Bibên bijî Kurdistan

Suta li ber te xwar kin
Bibê bijî Kurdistan

Tu jî rabî ser lingan
Bihirmijî Kurdistan

Le nutqekê bidî wan
Ew bitirsin Kurdistan

Destan li ber te vegirin
Deyn mede wan Kurdistan

Tu bê mafê karkiran
Tune li cem we Kurdistan

Ko wana ji te fêr nekir
Wan bide dar Kurdistan

Heta ji te fêr nebûn
Heq mede wan Kurdistan

Komara wan tev rabîn
Civîn bikin Kurdistan

Sîstema me dîktetor
Peran nade Kurdistan

Em zindanan boş bikin
Feqîr, gundîyê Kurdistan

Le em bibin Wekhevî
Wekî Kurd û Kurdistan

25.1.1987

## BIBIN HOSTE GELE XWE

Em rûnin li nav gelê xwe
Biben derd û kulên xwe
Ko em ji hevdi zanabin
Derman lêkin li rîşe xwe

Ew zanistî hoste me
Zane bi derd û kulê me
Nisaxîya ko werê gel
Ew xwe didê pêşîya me

Rîşe me tev dermanbin
Emê ji derdan xelasbin
Hoste derd û kulên me
Rojek em bê hev nabin

Ew dibêje bi roj û şev
Pir ramanîyan didê hev
Gelên nolê me bin-dest
Kom çê dikin teve hev

Hoste pirîyan dibêje
Gelî tev'da di bîse
Ew şoreşa bi oqtober
Ji gele xwe'ra dirêse

Hosta devê xwe vekir
Ji gel'ra qale yeki kir
Xortek hebû pir bindest
Rojek serî li xwe rakir

Lê va xorte li navê gund
Hemîyan pêra di go kund
Ew xorte pir belen-gaz
Nikane herê nave gund

Berê xwe da serê çîyan
Çima ez hatim cîhan
Tim birçî û bin-destim
Mala min bû serî çîyan

Tenkê dima li serî çîyan
Tazîr birçî û tev bê nan
Ejdirha tev min bûxûn
Şûna min tûne le serê çîyan

Dest avête kevire kaş
Pir dikuştin marê beş
Agir li ser çîyan dadida
Dibiraşt duxwar laşê reş

Piştê xwe da hîme kaş
Go ez marim le serê keş
Bû qehreman'ê ser çîyan
Azìn dida li dûr û paş

Hemû bajar û gundan
Kombûn li hev dicîvîyan
Ew xorte wekî bûman
Di nav gel'da qehreman

Bajar şênî û tevda gund
Neman bibên xorte kund
Nav lê kirin tim kawa
Bû seroke gele Kurd

Hoste çîrok xelas kir
Go em xwadî gele pir
Ku em deyînin zanistî
Em tev dibin hêza gir

Lê ko em negên hev
Em qe nabin teve hev
Ne çê dibin hostên jîr
Eme bimrin bi roj û şev

Seba ko em bigêne hev
Bibêj feqîr gelîyo tev
Bibin zana, jîr û xurt
Çima em negêne hev

Gelo em werga nekin
Em bi hev'ra şer nekin
Ko kedxwur werê ser me
Em winda û şerm nekin

Bikin kar û bare xwe
Serî hildin bi gele xwe
Seba dayîka me bin dest
Tev'da çêkin hêza xwe

Bibin hêz û tev'da yek
Hildin milan bomba û çek
Bi tektîk û bi ramanî
Ko em rabin lek bi lek

Em doza xwe germ bikin
Hinber kedxur ceng bikin
Ew sîstemên karkiran
Alî-kariya me bikin

Mebên tu kes nadê me
Pir dost hene bidin me
Top û rokêten mezin
Eme bidin dora xwe

Em tev destan bidin hev
Xebat bikin roj û şev
Li hinberî dijminan
Em bibin serî dev

Eme xwe tev xelaskin
Kedxur ji welêt rakin
Deyînin sîstema karkir
Zeft û gefte windakin

Em tev'da weyînin şadî
Li warê xwe bibin xwadî
Gund, bajar, feyîd û çîyan
Li her der bibe ronayî

28.11.1981

# LI HELEBCE

----------

Bi şefaq ra dengê bomban
Bi ser meda gurle berdan
Xirabe kir deyşt û newal
War û malê me bû talan

Xewê rabûm min didî xwûn
Dengê fîzan pir dinalîyan
Min nihêrî li dora xwe
Gurlê rokêtan dibarîyan

Top û rokêt hatin bi tîn
Lê pir mirin gî şewîtin
Dikir nalîn zarî û zêçan
Şênî li erdê perpitîn

Bale-firan gurle berda
Axû bi ser gelî reşîya
Tev dikete dev û çavan
Li helebce însan nema

Wî go haho wê kir qîrîn
Kesek nema bikin girîn
Xal, xaltî ap û dotmam
Ax şewîtîn tev da mirin

Ez rivîyam nav wa malan
pir miribûn ê dinalîyan
Dinê li serê min hate hev
Helebce li min bû wêran

Dilê min rabû kire qîrîn
Xwûşk, bira dayîk nedîn
Li ser serî diçûm erdê
Kesî li wêrê nekir bangîn

Le ew dijminê har û dîn
Helebce tev da kire xwûn
Kesek sax nema li varan
Ax min tenî xwe kire şîn

Gurlê axûyê hatin ser min
Şewat berda tev canê min
Jîna feqîr nema li dinê
Dijmin bir kurdistana min

Du rojan pêra

## NAMA KURDISTAN

Min xeberek girto ji evîne
Digirî dişaqîya derdan tine
Tu li werê mayê ez li xerîbe
Evînê şebabê lê lewende
Kevokê Şîrîne Kurdistanê

Navê te duxwûnim bi hesre cavan
Jana evîne ket pişt û navan
Evînê te nadim bi hezar yaran
Xwaşike nav darê Kurdistanê
Şîrîne bin deste bar girane

Bi nave welet sebrek li min
Janek kete dil û garcikê min
Le kanî welato tune e min
Ziravê bilinde le detmane
Xezalê şebabê Kurdistanê

Şefaq ra radibûn tev duçûn kar
Çima ez û teva mane bin bar
Evînê em ketin deste neyar
Çav reşê kulilkê lê xezalê
Zerîyê lewendê Kurdistanê

xerîbê nuxweşî derd û kulan
Le barê wletêt kete nav dilan
Bidin deste xwe pişt û milan
Kulilkê navdarê lewenda min
Kevokê lenvendê Kurdistanê

Silavê min ji tera wekî bilbil
Radmûsim levê ser çave bi kil
Welate te nadim bi hezar dil
Sebabê nav dare le kurmame
Xezalê navdarê le Kurdistanê

Rojek be tev werin welate xwe
Eme bikin xebat û kare xwe
Ji dijmin bistînin evîna xwe
Nazikê xwaşike le detmane
Nav darê sebabê Kurdistanê

Evîna min bi xer û ronayî be
Tev da kesk, zer û bi serayîbe
Her derê def, zirne û şayîbe
Kevokê bilindê Kurdistanê
Xwaşikê bindeste bar girane

Ez û te defeke xwe lexînin
Bejinê te zer û sor bixemlînin
Welat û Feqir va bi hevgînin
Çav reşê le detman Kurdistanê
Bilindê bin deste Kurdistanê

25.1.1973

# JI DIJMIN RA GORISTAN

Ez gelê kurdistan im. Bindest û bargiran im.
Seba ko em rizgar bin. Bi gel ra serê çîyan im.
Ew şerê xwe domkim. Bi karkir û va gundîyan.
Tev welêt bistînin. Kesk, zer û sor li bakim.

Bûme bindest pir salan. Tev reben û perîşan.
Wekî hirç û hovan ez. Wa dirivim serê çîyan.
Tewr werga qebûl nakim. Bibim kolê dijminan.
Sebe Welêt ez bimrim. Bijî şehîdê kurdistan.

Hinek bê çû, hinek ma. Divê rabim ser lingan.
Erd, ezman tev dengdê. Ji pêşmêrgê qehreman.
Wa dijminan bikujim. Çekim ji axa kurdistan.
Ew xwûna sor bi ala me. Bijî gelê kurdistan.

Li hinberî me rabûn. Çend devlete pir mezin.
Xwunxwaran pir hêvîne. Ko bimijin xwûna min.
Tev Ji min ra şerefe. Xwe didine hinber min.
Ji dijmin ra goristan. Ewa milkê gelîye min.

Feqîrim dil birîn im. Derd, kul bi qîrîn im.
Ez destê xwe vedmalim. Tev dijminan derin im.
Tev çêkim komara xwe. Ji hev hinir bistînin.
Bijî gelê Kurdistan. Tim serxwebûn bibîn im.

20.6.1984

## EZ Û BILBIL

Bilbilo tu bi deng û hawar
Dest pê bike li ser vî war
Bira cîhan tev bibîs`in
Em tev dikin xebat û kar

Tu bi şaki û em tim bankin
Tev gundîyan û xebatkarkin
Em çekin hêza xwe mezin
Xwûnxwaren ji ser xwe rakin

Tu ne şaqi em ban nekin
Ne ti kar û xebat nekin
Qefes a te em tim bin dest
Xwe rizgar û azad ne kin

Dilê min jî tev weki te
Me bir kirîye welatê xwe
Tu di qefesda ez li derva
Nikam biçim welatê xwe

Şefaq`ra çave min girîyan
Tune xwûşk, dayik û biran
Xal ,xaltî ew bav û kal
Ketin bin lingê dijminan

Li xerîbê ker û gej bûm
Ne hoste ne rêzan bûm
Ku ez bankim haho welat
Ji cîger`da tar û mar-bûm

Ez vê dikevim bi arê kêsê
Kul birîn û rîş tev dêşê
Kêm û xwûne derî vekir
Wekî çem kanîyan der te

Ketim xwarê li nav dijwar
Bankir haho welat û war
Dest didan ser devê feqîr
Ji wera tune welat û war

5.7.1984

## ALA RENGIN

----------

Ala rengîn tev sor û zer
Hildim jor xwe bidim ber
Roja şayan roja şadîyan
Silav bidim tev li hinber

Tu cehwer û xemla minî
Him ronîya çavê minî
Ez te hildim li Kurdistan
Tu duxwazîya dilê minî

Ala rengîn tu pir şîrinî
Kesk, zer û sor bi bînî
Bi cehwer û bi rima zîvî
Silav tu ji cîhan bistînî

Tu cehwer û xemla minî
Him ronîya çavê minî
Ez te hildim li Kurdistan
Tu duxwazîya dilê minî

Ala rengîn cehwer û xeş
Bikşînim jor ko bibî geş
Tev leşkerne Kurdistane
Pêş ronîya te bikin meş

Tu cehwer û xemla minî
Him ronîya çavê minî
Ez te hildim li Kurdistan
Tu duxwazîya dilê minî

Te didim tev da peş xwe
Bi hêz diçim dijmine xwe
Eze bikujim ger şehîd bim
Te bi jor xim li warê xwe

Tu cehwer û xemla minî
Him ronîya çavê minî
Ez te hildim li Kurdistan
Tu duxwazîya dilê minî

Ber ronîya te jîn bibim
War bi ol û leşker bibim
Xwudan hebûn dewlet bibim
Di zêr û ziv da kil bidim

Tu cehwer û xemla minî
Him ronîya çavê minî
Ez te hildim li Kurdistan
Tu duxwazîya dilê minî

Ez bi dev û bi serî bibim
Tang, firok û bi enî bibim
Ne feqîr bim dewlemend bim
Tox di ala xwe hil bidim

Tu cehwer û xemla minî
Him ronîya çavê minî
Ez te hildim li Kurdistan
Tu duxwazîya dilê minî

2.5.1971

## APE GEDUR

Apê Gedûr nav malan
Pir xizan û dilovan
Yekî di wirda zirtonê
Ne mirov û ne însan

Zirto bane Gedûr kir
Lê te nav gund çi dikir
Tu megerî li nav gund
Gedûr hêsrê xwe rêj kir

Gedûr duçû tev da mal
Ber mala wî pir delal
Hêsir ji çavan hate xwar
Tune kon, milk û mal

Gedûr kete ramanîyan
Dora wî da sîyaran
Gedûr kete rêça dûr
Go herim cem hevalan

Gedûr kete ramanîyan
Dera wî da sîyaran
Gedûr kete rêça dûr
Go herim cem hevalan

Gedûr diçû ser bêlûn
Li wêderê girte şûn
Yekî silav da Gedûr
Go rêç dûre dayê şûn

Go ez diçûm vî gundî
Ger tu rabere min kî
Xortê ciwan go Gedûr
Go tu ji kuva nas dikî

Go Gedûr pir mirovan
Dibên ew tim bi mîvan
Bi şeref û bi namûse
Dor wî xortê Kurdistan

Gedûr kêfê xwe xweş bû
Kenîya rûçik lê geş bû
Got birazê ez Gedûr
Xort ji dilê xwe geş bû

Dest dane hev bûne nas
Xwarin nan û ava tas
Feqîr xwatir ji wan xast
Apê Gedûr pir gernas

13.1.1976

## TE EZ RIZGAR NEKIRIM

Min tu hanî dinê pir bi kul û derdan
Min tu xwudî kirî bi va şîre beran
Ez bûme pêymal û ketim bin destan

Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim
Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim

Tu bûyî evîn û min xwe da ber te
Kedxweran dikuştin kek û xwûşkê te
Tu rivîyayî derva ez mam li dû te

Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim
Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim

Ez ketim bin barê pir û pir giran
Min li rîya te nihêrî ko werî varan

Te vedxwar şerab û tev ketî baran

Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim
Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim

Ez hesretim rojek kincan li xwe kim
Kejî, bisk û gulîyan ez tev da şekim
Gewr, kesk zer û sor xwe li bakim

Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim
Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim

Ez ketim bin lingê pir mar û mişkan
Dest dirêj nekir bav, bira û xwûşkan
Feqir li çolan ma ez xwarim kûçkan

Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim
Te ez rizgar nekirim, nekirim nekirim

25.1.1977

# PIŞTA MIN JI KEST

Ez dibêm welat tev jar û reben
Dijmin li ser me duxwê xwûna me

Em xebat dikin dozê germ dikin
Li hinber dijmin şerê xwe dikin

Em têne kuştin lê pir dukujin
Hêza dijmin gire me bela dikin

Em dibên kanî lê me çi hanî
Gelê belengaz tev bela dikin

Dîsa em bindest tev dibine mest
Ne kar û xebat pişt û me ji kest

Quloç û birîn xwûn darê şîrîn
Destê dijminda ew dayîka şîrîn

Divê em derxin bin deste dijmin
Bigirin dayîke nebên xwûn şîrîn

Rêxine bibin tev em bigênê hev
Sond bi dayîkê em negirînê hev

Em çekin hersaz tev bibin rezan
Hinber dijminan em bibin raman

Biçin nav gel le deyînin tevger
Bi xebata xwe ra tev rabikin gel

Gelî bawer bikin dijmin raber kin
Ku bawer nebin nikan şer bikin

Pir rabûn bi gel xwe didan hinber
Dijmin li pê me tev rivîyane der

Ew rabûn meşîyan gele me deşîya
Bi ramanîya dijmin gel jime rivîya

Karkeren Kurdistan em bigêne hev
Ku bibin yek ger bibin serî û dev

Doza me welat tev bikin xebat
Xwayînan derxînin ji qada welat

Rakin barê xwe hildin milê xwe
Em bibin pala çav dijminê xwe

Şerda jirbin li dijminan derbin
Dijmin birve ku em wezîrbin

Karkir perîşan çima gel êşîya
Bav û kalê me tevda dimeşîya

Herder kuştin pirek û dayikê me
Pê mal dikirn keç û xûşkê me

Didin ber sungîyan bûk û zarokan
Tev hilweşandin xirabe li ser me

Em talan kirin fariz û tirkan
Kirin mahcir bi çolanda berdan

Em bûne kole ew bûn koledar
Feqir li bin bar ew bûne serdar

Dijmin al çekir ji xwûna me sor
Ala mê rengî kirin bin lingan

12.2.68

## KARKIRNO WERIN EM HERIN

Karkirno werin em herin
Lê vir ne Welatê meye
Axa bav û kalê me gîyan
Di bin lingê dijmin deye

Şoreşger li Kurdistane
Bar hildan ser mila xweye
Bar ne barê her kesane
Ko bidon ser kola xweye

Karkirno ma qe nabînin
Xwûşk û bira tev dimrêye
Xwandewan kanin li virbin
Em herin welatê xweye

Em guh nedin derewkaran
Tevger li Kurdistan heye
Xwandewan kanin birivin
Riv ne karê kurdê meye

Kurdistan parçe parçe bû
Va bi destê zanokê meye
Feqîr go gundî şîyar bû
Wan tev rakir doza meye

25.4.1978

# W E L A T

Silave te min girt bi dil û çavan
Namè te duxwûnim didim ser seran
Le silav te şandin ji bav û biran
Te go Welate me kete bin lingan

Name te duxwand û hêsir rej kirin
We hesrete welet hişê min birin
Sance xwe berda dil û gurçikan
Welate min û te tev talan kirin

Te ji min ra şandê pir derda giran
Wî barî ez çito hildime milan
Kete dest dijmin ev mêrg û zozan
Gerek bare welet hildin ser milan

Em rakin wî barî hildin mile xwe
Gelî tev kom bikin bidin dera xwe
Bi ramanake rast hezeke mezin
Welet rizgar bikin ji dijmine xwe

2.5.1974

## HEVALE REÇA MIN

Ey hevalê rêça min
Tu werî dest bidî min
Rêçik diçê ser çîyan lo
Hilde milan barê min

Em derkevin sere çîyan
Tiving bidin ser milan
Bi vê hêza gele me lo
Em bistînin Kurdistan

Barê min pir giran
Nikam derxim ser çîyan
Tu jî xwe bide bin bar lo
Ko em bigên ser çîyan

Em derkevin sere çîyan
Tiving bidin ser milan
Bi vê hêza gele me lo
Em bistînin Kurdistan

Doza min û doza te
Li hinber dijminê te
Destê xwe bide Feqîr lo
Ko xelas kin warê te

Em derkevin sere çîyan
Tiving bidin ser milan
Bi vê hêza gele me lo
Em bistînin Kurdistan

2.5.1987

## ŞEWAT O NALIN

Zivistan, payîz lê çito havîne
Roj dijware dikelê pir bi tîne
Ji cîgera min diçê kêm û xwûne
Bê mal û halim ser min da şîne

Heta mirinê tim xebat karbim
Birçî, tazî tev da bê war bim
Di gerim li çolan wekî qereçî
Tim kole û bin destê neyarbim

Şov radikim genim cehe diçînim
Palê dikim şelê xwe dikşînim
dikutim bi gayê û gayê reş
Li şûna gênim zîwên hiltînim

Kulfet tev da bê nan û arvan
Dijmin hatin ez ketim dest wan
Şewat, nalîn, qîrîn û digrîyam
Ranebûm ser xwe tev dibûm talan

Gelê min kuştin tev kirin wêran
Feqîr rim girîyam bê hiş û raman
Dijmin xistim ser dev û çavan
Lê ew bûn dewlet ez bûm kolê wan

15.8.1969

# BERBANG

Bi berbang ra dibû hawar
Şênî û karkir rabû siwar
Tev rakirin das û balyoz
Erîş birin qata xwûnxwar

Wekî şêran rabûn ser xwe
Lê wan berda dijminê xwe
Şehitandin qesir û qonax
Dewlemendî didan ber xwe

Tev rakir sîstema kevnar
Ew zivistan li wan bihar
Sîstem ket destê Feqîran
Roj li wan sor nebû evar

Komar tev ket destê wana
Ne xizan bûn tev da zana
Tev bû şahdî û şahdemanî
Kurdistan ket destê wana

25.4.1979

XORTE KURD

----------

Xorte Kurdî pirî jîr
tenê duçû nav bajêr
bajarekî pir delal
Derbas dibû hukme mîr

Li nav bajêr dimeşîya
çend zirtone li paşîye
pir gotin jî hatin guh
gotin xortî neyî ji vir

Xortê delal sekinî
tev di xwûnda xemilî
gotin tu megere li vir
mîr hukim li vir danî

Dibirin cem mîrê sor
pirî pêşê pir li dor
danîn erdê lê xistin
can li wayî kirin mor

Çekirin zindana reş
têda hebûn pir keleş
tev birçî û dinalîyan
bextê me hemîyan reş

Bi zincîran girê dan
  bi şîqîna qirbacan
    şefaq ra gî birin kar
      sibê û heta roj avan

Dîsa kirin zindana
  pirs dikir xort ji wana
    gotin heval pirs meke
      lê ti çi digerî li vara

Ramana da xortê jîr
  nabê herim cem wezîr
    lê ez çito xelasbim
      Bi şewîtê mala mîr

Bavê xortî pirî kal
  pir roj dibû nate mal
    çima li bajêr werqas ma
      zû vegerîya bata mal

Sik û sare hindir mal
  digerin tev pîr û kal
    pir dipirsî ji gundîyan
      kesan bersiv neda kal

Pir axîn û bi derdan
  li xwe xistin digerîyan
    lê ew hidî pirs nakin
      mal û konê wan wêran

Dayîk rabû bi çolan ket
li cem destgirtê der ket
go keçik destgirtê te
zerî rabû nav gund ket

Lê digerîya û kar dikir
destgirtê xwe pirs dikir
pîrek hebû fel dar bû
qale xortê jîr dikir

Dinê li serî gîşte hev
ez herim wî dibêjim tev
got lo apo lawê te
zindanada bi roj û şev

Pîr û kalê go lawo
li mala wan bû haho
lê xortê me çawa bû
li xwe xist dê û bavo

kal bi dizî çû bajêr
leşker jor him li jêr
leşker kalê ne bîne
kal bi kevê nav bajêr

Kalo kete nav bajêr
gelî dikir qîre wîr
derdê kalê pir giran
hêsirê çavan hatin jêr

Kal gîşte cem mîrê sor
wezîran xwe dabû dor
bi silavan û temenan
diçû destê mîrê sor

Bi emir û fermana te
ez hatim cem mîrê xwe
lawê min tu baxşîşkî
ez bibim xwulamê te

Qebûl kir kalê xwastin
eme kolan bi hevgînin
dema sibê wexta cot
lawê te ji nav derînin

Kal pir kete gumanan
kirin çavîya mîvanan
lê xwe bi çavan neket
çav sor dibûn dirizîyan

Soro emir û rakir dar
kolan derxin bibin kar
xortê çeleng hûn mebin
wana bidim sermîyandar

Xortê ciwan derxistin
bi peran tev firotin
lawê kalê bi wan ra
lê bi qetera ajotin

Kalê sibe lê ron bû
  eceb mîrê sor rabû
    rica min e pir mezin
      li cem wayî qebûl bû

Dîsa çû cem mîrê sor
  xwe avête dest û dor
    soro emir da lesker
      lawê kalê wînin jor

Çûn xorte jîr wînin
  di zindanda nebînin
    xortê delal firotin
      nema paşva bistînin

Leşker çûn cem mîrê sor
  temene dana tev li dor
    xort bi çewtî firotin
      halê leşker tev da zor

Soro awir da leşker
  go leşker tev lawê kêr
    gote kalê ez çibikim
      eze lêxim li leşker

Kal derdiket hate mal
  pîrê dikir gale gal
    kalê kela dil rabû
      nema bikê qal û wal

Gundî hatin cem kalê
  gotin lawê te li kêrê
    kalê go ew mîrê sor
      xortan dibê bi zorê

Feqîr rabû gote wan
  rabin herin ser mîran
    text, tac û malê wan
      ko bikevê bin lingan

Soz dane hev bûne yek
  tev rakirin bomba û çek
    sistem kete destê wan
      bi çek darî bûne yek

1.4.1973

# EVINA BE HEVÎ

Çeleng, rind û evîna min
Agir berda ser canê min
Tev kirim dîwane mahcir
Te hilweşand bedena min

Te ez kirim navê derdan
Xwûn û kême hete berdan
Tev şewat, nalîn û qîrîn
Min hêsrê xwûnî beradan

kal, mahcir bê war kirim
Xizan û pir neçar kirim
Evîn li ser mil û çavan
Bê Welat bê heval kirim

Meh û salan evîn li min
Sancî tev kete dilê min
Ez dame ber gurlê topan
We xirab kir jîyana min

Te dinê li min tarî kir
lê bê hinir bê hêvî kir
Ez feqîr li hêvîya teme
Rindê were min bibe wir

25.1.1978

## DEŞTA BERAZAN

Gotin li deşta berazan.Mêrovekî pir xizan
Roj û şevan dikir kar.Dernedixist mafe nan

Bi salan û şeş mehan.Dibû kolê koledar
Hebû kulfetekî xwe.Zarê xwe didan pê xwe

Rojek jina koledar.Banêkir go were mal
Jina kolê hate ber.Go tu derkevî ji mal

Go xatûnê çima wa ?Go ez dibêm here mal !
Hat mala xwe dikir kar.Hindir malê sikî sar

Nan û pivaz dixwarin.Ji mêrik dixwast pirsîn
Zlam berpirs nedayê.Hêsire çavan hatin xar

Go tu megrî rinda min.Xizanî bû barê min
Lê ku ez nexebitim.Eme çito xwedîbin

Tu destê xwe bide min.Emê xizanîyê hilkin
Ew kulfeta pir delal.Destê xwe da belengaz

Zarokê wan tev jîn bûn.Naxûn nanê koledar

Dayê tu nan pir çêke.Eme bankin tev şênî
Rojek wê bê gelê me.Rabin bi ser bilindî

Emê hevra bikin kar. Tev lêxînin sermîyandar
Eme hêza xwe rakin .Hilweşînin textê wan

Mal ,xemil û xêza wan.Emê belakin li gîyan
Go kurê min ne wanî. Xweda mal ji wanra anî

Gotin dayê bi serê te .Va ramanîya ne a te
Va koledarên mezin. tim dimijin xwûna me

Bavê meyî pir salî. Em rezîl û tim wanî
Ew nan û zixîra me. Bi xebata xwe anî

Kalê bavê hate mal. Hindir dikir gale gal
Kalê brpirs ji wan xwast. Em nabin kolê tu kesan

Kalê avirek dida wan. Xort derketin ji hindir mal
Xebat kirin roj û şev. Gundî, şênî û gel tev hev

Didan kar û barê xwe. Hildan milan barê xwe
Diçûn cem koledaran. go hûn derkevin ji malan

Koledaran go haho. Bankirin bavê wana
Kal derketin pêşa wan. Hûn çi dixwazin ji began

Gotin bavno werin vir. Hûn bavê me em jî kur
Emê lêxin li began. Tev'da bixun malê pir

Gotin gelo wa nabê. Li hinber kedxar şer nabê

Wan bavê xwe girêdan. Tev lêxistin li koledar
Mal, milk û qesra wan. Dişehetî li bin lingan

Dewlemendîya wane gir. Tev ket destê gelê pir
Hefsar kirin histîê wan. Kirin kûçikê ber malan

Komara xwe çe kirin. Serokî ket destê wan
Kawa'ye hesînkar anîn. Li ser Kurdistan danîn

Dibû şadî û şênayî. Li Kurdan dibû ronayî

Ew dema çû îro ma. Em jî rabin ser lingan
Xebat bikin roj û şev. Gîşkî bibin tev hev

Bi vê rêça karkeran. Eme lêxinin kedxwuran
Ne şerê tiving û şûr. Eme rakin balefir

Her alî û karê me. Pir dost heene bidne me
Top û rokêtê mezin. Eme bidin dora xwe

Eme bikin ceng û şer. Koledar bidin ber xwe
Ew şoreşgerên li dinê. Bikin alîkarîya me

Em Kurdistan bistînin. Ji destê dijminê xwe
Eme ala xwe rakin. Çê bikin wekhevî'ya xwe

Lê ku em negêne hev. Hevra bikin ceng û şer
Nola kalê pir xizan. Li xînin koledar

Ta zarokê me rabin. Ew bibên wax bavê kal
Destê me tev girêdin. Ewna lêxin li koledar

Va esîra eê bîstane. Em ketine bin lingane
Va ne dema koletîye. Li ser mebin koledar

Dema rokêt û fizan. Em çi dikin gale gal
Va pîsîya û qerêşîya.Çima ji mera buye mal

Bi ramanîya dijminan. Ketin gremolî'yê û kulan

Wan xayînên Kurdistan. Gel firotin çend pûlan
Qûna xwe didan dijmin. Bûn nokêrên kedxwaran

Va lîske'ke pire kûr. Kete navê gelê hûr

Ew dema beg û axan. Kurdistan kirin çaran
Va çîroka Kurdistan. Ketê destê dijminan

Gelê feqîr li bin destan. Pir reben û perîşan
Gelo serî li xwe hildin. Bixwun xêra Kurdistan

15.1.1982

# EY MILETO

Ey mileto bin desto pir bar giran
Werin bigrin destê hev wekî biran
Her kes darê hîvê, sitêre û deran
Em mane bin dest, reben û talan

Di dinêda carek tev rabin ser xwe
Bi zanisti bikin kar û barê xwe
Bidin hevdi dest, pişt, dil û can
Dijminan zorê derxin ji warê xwe

Wekî morîyan bikin xebat û lebat
Hinberê dijminan bibin hêz û lat
Tevgerê da enî.Tektik û pêşva çûn
Ko xelaskin ji destê dijmin welat

Ko nekî tektik, enî û yek destûr
Bin destê dijminda bibî tar û hûr
Her kes werê li ser te bidin dar
Nema tu miletî nema tu bikî kar

Tu mayê şerpeze bin dest û reben
Ne mal heye ne hêl heye ne dûzen
Rabe ser xwe di dinêda bidî deng
Bi tekoşîn yan tuneyî yan hebûn

Ey feqîro dûzena xwe tu çêke
Ala rengin bi ser xwe da li bake
Di dinêda tu jî heyî yek milet
Fîze firok û Komara xwe peydake

2.11.87

## Derîya Evînê

Min yek didî misk û enber
Wek kulîlkan xwe dabû ber
Kenbera zîv li bejina zirav
Gulî û kezî tev berdan ser

Çave min li bejna wê ket
Dilê min da xençer lê ket
Ez bûm Feqir ji dest evîne
Pêta agir bi mala min ket

Hilol bûm derîya evînê
War talan bû dil birînê
Dişewitîm bi roj û şevan
Gazî û qîrin kesek nînê

17.6.1987

## EZ KURMAME TEME

Kanîya gund xule xule av jê darê
Keç û bûkan satil rakir çûne avê
Xortê gundê me rabûn wan nihêrîn
Por û gulê xwe berdane serê navê

Keçik rabûn pir hêdan pêşva hato
Dest li bakir law law kurê fato
Şerm nakî li me keçika dinêrîye
Eze herim te bibêjim li cem bavo

Min go rindê haho bîla tu mebêje
Ew bavê min bi rişêşê li min xîne
Ez evdalê bejina, lêv û gulê teme
Keçikê tu mebêje ez kurmame te me

Mada xorto dilê tejî li min heye
Wê mal-batê rake werî mala meye
Bistînin sozê gulî min keçikêye
Bibî zave ez bibim kevanîya teye

Bane şênî bikin defa xwe lêxînin
Por, gulî, kejî û piştê bi şidînin
Hine bikin Ala-rengin bixemlînin
Deste te û min feqîrî hevdigînin

12.7.1979

## MEMOSTAN CIGERXWUN

Ser pirtûkê nivisandê Cigerxwûn
Gundî gotê bi karkira tev rabin
Lê dibêjê xwandewane qenc û baş
Dida navê bi hezaran serxwebûn

Kesan hene li Kurdistan pir qeleş
Nenivisîya neket nav helbestê xeş
Pir bûn rêzan ji bo gelê Kurdistan
Lê duxwandin ew helbestê pire xeş

Ji dîroka tewre pêşin veqetîya
Lê guh-derzim kîme ezim da zana
Xeca sîyahbend digo lawê min lorî
Li ser Kurd îro her-kes bû peya

Ew Ehmedê xwanê çandî nêzik kir
Rabû seydâ va çîroka nivis kir
Raman bû karkir, gundî û belengaz
Kesan rabûn va dîroka berbat kir

Tu kar dikî ey saydayê Cigerxwûn
Gelî hemû dil, gurçik tev bi xwûn
Mele rakir bi sed hezaran pêşmerge
Destê nokêr pêşmerge pir şehîd bûn

Te li ser va xwandewanan pir gotê
Le çima nokêr, axa û xayîn ne gotê
Lê kê kuştin ew pêşmergê qehreman
Hinek hene ji Kurdistan ra lê kotê

Wanî kirin em tev didan bin destan
Çar paran bû didan fariz û tirkan
Lê xelkan çêkir al, ol û warê xwe
Tev-hev xistin Kurdistan bû talan

Pir çê kirin rêça karkirên cîhan
Rêxine kirin Rûs, Vîetnam û Çîn
Hemû bûne dijminê hev ji bo wana
Xelas dikin destê Rûs û yan bi Çîn

Dibên werin xelasîya we bi destê me
Çend karkir û gundî dane dora xwe
Bê ramanî bûne dijmin bi hev ketin
Çekel û rûvî tev dilîzin bi gelê me

Bawer nakin ji karkirên Kurdistan
Dibên eme welêt derxin bin destan
Çend zarok jî danê ber wê komelê
Kî dil sozin dibên dijî Kurdistan

Ey memostan çima tu wa dibêjî
Kanin çibikin serokan bi vî hişî
Sebe serokê hevdi dikine ajan
Hîn çê dikin ji bo gel ser êşî

Navê marx û lenîn her-dem dibêjin
Lê ewana teşîya xwe tim dirêsin
Rojek were Welate me rizgar bê
Vana dîsa li vê derê serêşin

Ko nan xeş bê vana tev da şoreşger
Bi gotinan marx û lenîn pir bawer
Karkir, gundî û belengaz dikin ajan
Rêxne nabin dibên emin şoreşger

Bas dizanî vana ji gel ra nabin kes
Wana time li nav gelê me rû pir reş
Tu bane gelke ko şîyarbin ne xapin
Em li nav gelê xwe nebin tim rû reş

Emin karkir em hêsîrin em neçar
Em bê malin em bê halin em bê kar
Em radibin, em dirivin tene kuştin
Mirin ji mera wanara qonax û bar

Ey memostan heger ez rast nabêjim
Lê bigêm cem te ez ji tera bibêjim
Ko van hatin rûniştin tev bûn yek
Ez feqîr ra gelê Kurd ra dengbêjim

17.7.1981 Feqîr Ahmed

## BAXÇE GULAN

Ez diçûm cem yara xwe
Hêsir û bin bara xwe
Çima yara min digrîya
Min ew hilda milê xwe

Min go megrî yara min
Lê tu xemla mala min
Dilê min te şah dibê
Evîn tu bin bara min

Min yar danî ber gulan
Jana yar avêt va milan
Destê yara min sar dibû
Min da ser herdu milan

Bankir haho yara min
Serî hilde gewra min
Tev da çolan dikevim
Sebir, can û dilê min

Yara min serî hilneda
Min ji ber dil berneda
Ez dibûme kor û gêhej
Min xwe bi zinaran veda

Min destê xwe jê vekir
Gul û gupik bi ser kir
Bûm hêsir û tim bê war
Pûk û baranê li min kir

Lê dest danî ser dilan
Girîyam wekî bilbilan
Yara feqîr Kurdistan
Yar nekir baxçê gulan

17.1.1967

# HEVALEN CEFAKAR

Va çîyana mezin, bilindin û dirêjin
Cîzmê xwûn rê dernaxin serê çîyan
Xezalê va çîyan nê girtin û narivê
Bi rimê dijmin ne kuştin û nakevê

Şefaq lê ket sitêra sor li ezmanan
Şewq da erd û ezmên gel rabû û rabû
Herhebe gelê me çand ew rez û zevî
We ji bîr nakim hevalên me cefakar

Va çîyana bilind, serî sorin bi xwûnin
Em hevalê gelê bindestan gîyanin
Ko şewitî dar û ber heval gî bi hevdira
Hevalê cefa kar dişewîtin bi hevalî

Şefaq lê ket sitêra sor li ezmanan
Şewq da erd û ezmên gel rabû û rabû
Herhebe gelê me çand ew rez û zevî
We ji bîr nakim hhevalên me cefakar

Dijmin derxînin buxwun zevî û rezê xwe
Li bûran xebat dikin keç û lawê me
Roja xwe gî bikin xebat û lebat
Tim bijê feqîr û gundê Kurdistan

Şefaq lê ket sitêra sor li ezmanan
Şewq da erd û ezmên gel rabû û rabû
Herhebe gelê me çand ew rez û zevî
We ji bîr nakim birayê min cefakar

1.7.1977

## JINA MIN KETE DEVE GURAN

Iroj dîsa ferman rabû
Pergala me tev bela bû
Dijmin avêt fîze û rokêt
Bajar û gund xirabe bû

Şehetandin kon û dewran
Ber pîyan çû mal û ferman
kuştin dayîk, xwûşk û bira
Ewê mayî hevra girîyan

Hate ser min serma merde
Kul, birîn û rîş tev dêşê
Jîyane xwe ji ber min bada
Li ser serî diçûm erde

Hêze xwekir pişta min eşîya
Hunir duçû dilê min weştîya
Jîyane xwatir ji min xwast
Hûr û pûzûr li erdê weşîya

Ez ban dikim bav û biran
Li min her der dubû wêran
Lê feqîr rim diçim ji vir
Jîna min kete deve guran

11.11.1988

## GELE HEJA

Xortê gundê me tev da
Gîşkî rabûn bi hev ra
Diçûne nav zevîyê xwe
Mirin mayîn bi hev ra

Pir werga çû meh û sal
Tev da bûne xwudan mal
Bi xebata xwe tim mêr
Li xwe kirin kurk û şal

Çêkirin bajar tev gund
Ew mêr bûn nebûne kund
Mal, zarî û tev da jin
Lê tev bûne ser bilind

Dijmin tev hat nêze wan
Lê çav berda milkê wan
Dijmin didan ber gurlan
Rivîya dijmin ji ber wan

Gotin em ne xwûnxwarin
lê gûndî û xebat-karin
Kî çav berdê milkê me
Em tev dijminê wanin

Emin giran tev da lek
Destê meda bomba û çek
Emin ji kezan natisin
Dev bi hêz û tevger yek

Hêza gelîyê me tev da
Tev radibin bi hev ra
Em ne kurdê zirt û dîn
Lê hev bi kujin tev da

Wekî kurdan nabin dîn
Heroj bi ser wenda şîn
Feqîr, şêx û tev dedan
Dijmin ew dine ber zîn

Dijmin li wan siwar bû
Pîn lê xistin kurdo dû
Kurd do tev da bû kole
Ji dest wana jîn du çû

Lê tev ketin nav derdan
Tev rabûn bi hev vedan
Lê bûn tirşikcê dijmin
Dest ji warê xwe berdan

9.2.1987

## SILAV JI BAVO RA

Silav dikim bavkê xwe
Lê eme pire bi şînin

Te dayîka me berdaye
Em kê çito we bibînin

Bilah bavo werg nabê
Zarok tev da birçîne

Nan û şîva me tune
Em tev hevdi digrîne

Ji Mûsil heta Sêwas
Entep, Meletî û Xinis

Kermenşah, Dersim Bitlîs
Girîyan dayîka me kanî

Riha, Warto ka Kerkûk
Amed, erbî û girê-sor

Wan, zexo û ezir-can
Em digerin dayîka xwe

Em bi lep lep pêşta çûn
Deşta Mûşê gî bi tutûn

Em rivîyan û tev hev çûn
Deyîşta berazîyan bi xwûn

Em rivîyan ser dar û ber
Em agirek aveti li ser

Şewqa wî agirê li jor
Kurdistan kir sor û zer

Em çûne cem bavê xwe
Me jê pirs kir dayka xwe

Bavo were tu bi me ra
Tev bigerin li dayka xwe

Bavê rabû û li me nihêrî
Go hûn dixazin dayka xwe

Me go çito naxwazin
Go hûn rakin çekên xwe

Go dayka we Kurdistan
Dijmin xistê bin destan

Me go dijmin çîkê me
Go dijminê bavê we

Sebe maf û doza xwe
bidin feqîr soza xwe

22.2.1974

## GELE KURDISTAN DE RABIN

Gele Kurdistan de rabin
Ma eme tim li erde wabin

Marê reşî di warê mede
Em ji xewe şîyar nabin

Va ejdirha pir mezine
Li ser cîyê veketin

Ko em ji xewe şîyar nebin
Ew hestîyê me tim bixwûne

Va ejdirha çar serîye
Dev avête jîn a meye

Dayîka me sînge xweyî gewr
Bi ser da axu ber dayêye

Dayîke em çiwa jîn kirin
Ji tuneyê jîyan kirin

Sînge dayîka me kalî gewr
Mar û mişk çar paran kirin

Xûşk û biran rabûn girîyan
Maran dibir dayîka biran

Dayîka me şîqînek vê ket
Min derxin ji destê maran

Tev'da şîqîn ket dile min
Bê dayîk em li kêre razên

Zarok bira gîşk birçîne
Dayîk mere em bimijin

Her çar maran li me nihêrî
Em li hev kombûn bê benî

Me go bijî çîna karker
Eme doze bibine sêrêî

Gele cîhan li me nihêrî
Ew marana gîşk bûn rûvî

Me go dayîka xwe bigrin
Dayîk di kirin qula rûvî

Gelîyan hatin gotin roj baş
Me go çi digerin li kermekaş

Gotin em tev bibin heval
Em rûvîyan gîşk bikin laş

Me go em çito lêxînin
Qula rûvî hilwaşînin

Her çar linge rûvî qutkin
Dayîkê ji dest derxînin

Me tevir û bêrên xwe hanin
Le li ber qula rûvî danîn

Tevir lêxist herî çekir
Gel ji mera taste hanîn

Feqîr go lawno hele mekin
Em li qule dûman bikin

Demek dirêj rûvî di warde
Em ji xerbî û bakur derkin

1.3.1979

EMINE

-----

Xeber gîhşte we emîne
Xwunda ji min ra dişîne
Di go ez bûm evîna te
Ketin şûna mem û zîne

Xeber da min serî û çavan
Jana emo kete navan
Ez bandikim tev li çolan
Ew zîne ez memê alan

Siwar bûm li bozê rehwan
Pêş min qonaxa şeş mehan
Ez gîştim cizîra-botan
Derket pêş min zîna zêdan

Min bankir lê lê tu zînî
Dotmama hesen, çeko tacînî
Lê tu xwûşka mîr zengînî
Çel çarê bi kenberê zerînî

1.4.1978

# SERKETIN U BILINDI

Hil bidin ha hil bidin. Ala rengîn hil bidin.
Li her derê yekdest bin. Ko em tevda jîn bibin.
Tev da çêkin hêza xwe. Ji dîrokê fêr bibin.
Hinber dijmin seran ser. We hêza dijmin bibin.

Bi tektîk herin dijmin. Di cengêda deng bidin.
Em tev da bibin çar qatî. Ko em cengê hobibin.
Him bikujin him bimrin. Seba welat bistînin.
Ko em bibin serî û dev. Di dinê da deng bidin.

Seba bijên tim xebat. Eme bibin yek tevger.
Li hinberî kole-daran. Ko em rabin herin ser.
Bi ciwakî li dijmin xin. Ji kurdistan bikin der.
Ew feqîr rê we kurdan. Bira bibê kurd li ser.

25.1.1986

# VA AXE XAYIN

Sêwas û Dêrsim da heta bi Mardîn
Welat kirin talan va axê xayîn
Welêt rizgar kin karkir û gundî
Paşwa li me xistin va axê xayîn

Ji dijmin ra derî hemû vekirin
Xwûn rijandin ser xweva kirin
Du qulî kirin ko bibine nokêr
Li gel feq vedan va axê xayîn

Dijmin ra ceng dan bav û kalê me
Lê xwûn dirjandin xwûşk û kekê me
Ketin pêş dijmin li me digerîyan
Em didan dest dijmin va axê xayîn

Ne duçûm cengê tim xwe veşartin
Nihajî werganî hûn axeyê xayîn
Ji kalê meda man xwanê xirabe
Ser xwe tapî kirin we axê xayîn

Hûn tim dijmine xwûna gelê me
Hûn hidî dijminin ji bo gelê me
We em pir firotin tev qetil kirin
Lê tev bûne gewad hûn axê xayîn

Gelî ji dest we xwûn vereşîya
Reş girêdan xwûşk û dayîkê me
Di ceng da mirin bav û kalê me
Bê nîkeh bûn zava hûn axê xayîn

Rojek werê hûn tev wekî kûçikan
Sir dan dijmin rivîyan ji meyîdan
Gel xwûn dirjandin hûn xwudan gund
Kurdistan firotin we axê xayîn

Ji Wanê, Xwarpût heta bi Rihayê
Em tev şîyar bûn zanin hûn xayîn
Birîna me mezin we xê pê reşand
Histê Feqîr xwar kir we axê xayîn

11.12.1966

## BELENGAZEN KURDISTAN

Belengazên Kurdistan
Destê bi qiler vemalin
Gurl û bomba bavên jer
Bira kedxwûr bi nalin

Bi ciwakî û pir xebat
Tev bibin zinar û lat
Kokê li kedxwûr bikolin
Ko bibin xwudan welat

Berxwedan û pêşwa çûn
Alikarîyan pir bibin
Du xwaza da bibin hêz
Cîhan bê kurd pêşva çûn

Şîyar nebin li cîhan
Dest Nagêne hemû cîyan
Bi boranî bi germolîye
Nabin xwudan kurdistan

Dijmin geftan dide me
Arîzîn leşker li ser me
Averû bikin le çima wa
Duxwastinî ne li cem me

Bi teşêya gele xwe
Azîn deyînin li nav xwe
Di xwazada bi ciwakî
Gir se hevxin em bi xwe

23.10.1980

# ÇEL U ÇAR

Hezar nehsid çel û çar
Rojê xwe çekir ji mel
Ez der ketim ser dîyar
Yekî ji min ra go silav

Min go roj baş mirovan
Go ez li te bûm mîvan
Min go li ser va çavan
Fermo rûne li ewîyan

Em rûniştin li ewîyan
Go de bibê dilo van
Min go bibêm bi çi rengî
Min dest ji tiştan berdan

Wî go çima te berda
Lê min milkê xwe berda
Me hîn dikir gale gal
Şênî hatin bi ser da

Yekî ji vir yekî ji wur
Mîvên devê xwe vekir
Go ze ji wera bibêjim
Ko hûn nekin qîre qîr

Mîvên xilçik vemalan
Palê xwe dida belgîyan
Qelûn bi tutûna mûşê
Da mabênê herd lêvan

Qelûn dikişand dûman da
Çavê wî li herder gerîya
Em tev bûne ker û lal
Mîvên çîrok bi ser da

Go yek hebû li bolavîya
Bax û bostan tev winda
Rakir dar û barê xwe
Berê xwe dida kuba

Bû karkirê karkistan
Her şev diçû nav dostan
Lê şevekê civîn dan
Go em ketin bin destan

Roj û meh tev derbasbûn
Roj bi roj dost windabûn
Rabû diçû nav rezan
Hevalê min winda bûn

Lê çav li wî dibûn sor
Li dora wî dibû şor
Ew sekinî û guh dar bû
Hevalan xwe dida dor

Tev rûniştin li wêrê
Go hûn diçine kêrê
Lê em diçin kêrê
Ko kedxwur bikin bêrê

Gîşkîyan go bi xatirê te
Lê em biçin ji cem te
Niha xwûnxwar bibîne
Tejî bikê teve me

Go ezim hevalê we
Nikam bijêm dûre we
Ezim qata Feqîr ran
Mirin mayîn teve we

22.10.1988

# D I L E   M I N

Rojek dilê min rabû
Xem û xîyal bela bû
Keçik hatin nav daran
Dilê min bi wana şahbû

Di nav wanda yeke xweş
Ser bilind û çave reş
Bejin zirav gewr û kesk
Navê wê bi cîhanê xweş

Bejin zirav û pir delal
Hezkirina min meh û sal
Wê xwe berda dilê min
Ne min tune kon û mal

Paşva hatim mala xwe
Dê go rûne li şûna xwe
Min go dayê ne werga
Go binêre li dayîka xwe

Min go dayê yar nuxweş
Gelîyo tu bi mera bimeş
Ez yara xwe xelas-kim
Bi gelê xwe û hêza geş

Ezda awurek da ser min
Go tu şaş bê lawê min
Tu dengê xwe meke ji wê
Ew êşîn li dilê min

Min go Ezda ew a min
Kenîya ha ha lawê min
Min xwe dida benda wê
Ew hîn nate destê min

Go lawê min ew pir çûk
Ew hîn nebê bajar û sûk
Kesk, zer û sor lêkin
Ji Feqîr ra bikin bûk

Gereg em rabin ser xwe
Gelî bidin dora ber xwe
Bi tektik û bi raman
Dijmin derxin ji warê xwe

Go gelîyo em tev rabin
Xwudan hêz û zanabin
Ji dijminan bistînin
Ew bûk bê em zava bin

4.11.1985

## SITER

-----

Ez ban dikim te sitêr'ê
Tu bi şewqî li vê derê
Çelengî bi te şah dibim
Tu pez berdî tevda bêrê

Sitêr dem û roja te baş
Gulî sor û rû li te geş
Bejina zirav delal û rind
Kesk, gewr û sorda tu xweş

Carek dîdî sitêr bi gul
Bû evîn û xwe berda dil
Min kir ax, fîxan û haho
Derdê sitêr bûme bilbil

Sitêr te dilê min qul kir
Derd, kul û keder pir kir
Ew barêkî pir û pir giran
Tev'da li milê min barkir

23.1.1978

## EVINA BE OL

Gewrek dît rind û delal
Ez ketim nav evîna dil
Dest û lingê min girêdan
Min kir qirin wekî bilbil

Ew gewra evîn û bezar
Gulî û kezi tev têne xwar
Nav dar û çeleng çav reş
Ez li hevîya evîn bekar

Derd û kulan ez kal kirim
Bê jîn û bê hêvî kirim
Evîn rojek neket dest min
Ez bê mal û bê war kirim

Meh û salan evîn li min
Xençerek berda dilê min
Ez Feqîrê derd û kulan
Evîn rojek nate ser min

19.3.1968

# SISTEM BU A GUNDI U KARKIR

---

Rabûn ser xwe rabûn ser xwe
Çol û banî tev dan ber xwe
Tu kes nîne li hinbere wan
Ala karkir kirine dest xwe

Xeml û xêz û malên began
Dişehetîya ket bin lingan
Çîya û zozan didan ber xwe
Belengaz û qata gundîyan

Serî hildan karkir û gundî
Diket dest wan ser bilindî
Tev lê xistin li koledaran
Wan hilwaşandin dewlemendî

Rabûn ser xwe gundî û karkir
Gele bin dest bi xwe'ra kir
Bûne pola li hinber dijmin
Sîstem bû a gundî û karkir

Darê azadîye ji xwera hanin
Li ser Kurdistan danîn
Belengaz Feqir û gundîyan
Bi destê xwe sîstem danîn

16.1.1982

## RAKIN ALA CENGE

Gelî ji min qeherêye
Dibê rabe bi hawarke
Go em ketin kul û derdan
Rabe gel li rê siwarke

Siwaro dizgîn dest te dê
Xwe li serê çîyan beyanke
Gundî feqîr bira rabin
Serê çîyan toz û dûmanke

Heta kînge tim bindest bin
Di dinê da em wa bijên
Ereb, tirk û ecem li ser me
Xwe rizgar kin yan tev bimrin

Bê mirin gel rizgar nabê
Dinê da tew natê dine
Em destûr û yek hêz bibin
Ko em rakin ala cengê

13.6.1988

## Barê Welat

Ji enbara kul û derdan
Dikim nakim xelas nabim
Kire bendek avêt milan
Çito dikim tewr ranabim

Le va barê kul û derdan
Ser milanda hate berdan
Di bin barda ketim xwar
Dikim nakim xwe der naxim

Birîn, derd û kulên giran
Ser singanda hate berdan
Tim ban dikim kesek nîne
Dikim nakim xelas nabim

Bar li ser min barê welat
Feqir di binda nake xebat
Xelqan çekin tang û firok
Ji vî barî xelas nabim

1.1.1978

# GOVEND

------

Tu bi xêr hatî vê govendê
Def û zirne li pê teye
Tu deste xwe di destê minke
Eme şen kin vê govendê

Xorto were em xwe li bakin
Dîlana keç û xortan kin
keç û bûkên vê govendê
Ser meda zilxitan li bakin

Keçê were bigire dîlan
Iro ji mera yekî gulan
Dinê tev bû gul û gupik
em bi hevdin dest û milan

Dilê min ji wekî te ye
Didî me te deste xwe ye
Feqir û gundîyê kurdistan
Tev dom bikin jîna xweye

1.5.1972

## LEVA SOR

Bilind rind û çav reşa min
Bejina te mêji bir ji min
Ew bejn û balava delal
Bi dil bimeş were cem min

Tu werî eze jîn bibim
Bi hêl û bi hinir bibim
Ew hêz û tev evîna te
Bi mal û ez tim jîn bibim

Eze bînkim ew gulîyê mor
Maçek bikim ji levê sor
Bejna te wekî kulîlkan
Tev'da gewr ew kesk û sor

Tu neyî eze dîn bibim
Bê hêl û bê hinir bibim
Ji ber evîna tê delal
Bê xwuda bê hêvî bibim

Tu neyî ez dikevime cîyan
Beşek xwar ji dinîya cavan
Dikim nalîn ji derdê dilan
Janeke xwe berda milan

Feqir bankir tu neyî malan
Te lê xist remzek li milan
Ew agir û şehwata te
Xwe berda gurçik û milan

24.12.1979

# ŞÎNA WELAT

Hele werin rabin rabin
Herb û cenga girane

Ser amed û dersim da
Gurlê topan berdane

Şîqîna serebi-nalan
Gurle jorda barîyane

Qîrîna mence-seran
Xort li erdê weşîyane

Kalê me pîr û zarok
Tev dane ber sunguyane

Xwûn li erdê dimeşe
Wekî çem û kanîyane

Leşkerê dijmin hatê
Tev ketê nav malane

Pîr, bûk û zarokan
Kirin hindir xwanîyane

Qazax û benzin kirin
Di arda perpitîyane

Girtin destê keçikan
Berî didan çolane

Kêçe me por zerînbûn
Bûkan sorik hildane

Dest leşkerê dijminda
Qîre qîra zarîyane

Pêşmêrgê me qehreman
Xwe ji çîyada berdane

Pir dikuştin dimirin
Hêza dijmin girane

Gurle jorda dibarîyan
Wek zîpikê ezmanane

Xort û leşkerê dijmin
Sungu di hev hildane

Dijmin damîşê nebû
Pêşmêrge da ser wane

Axê Kurdan xwayîn bûn
Bi dijmin'ra îmze dane

Ordîya çaran dihanîn
Jorda gurle berdane

Bi emrê fewzî-paşa
Xort li erdê weşîyane

Simêlê xortan reş bûn
Di xwûnda xemilîyane

Heyfa xortê me Kurdan
Ketin dest dijminane

koz û perde li dar bûn
Bûk li şûna wan mane

Bûkan sorik çekirin
Reşê xwe girêdane

Lê keç, bûk û zarîyan
Tev didan ber hespane

Berî didan amasîya
Jontirk li Kurdistane

Ala mê rengîn danîn
A xwe hildan li ser çiyane

Lê xayînên Kurdistan
Bi dijmin'ra ketin rîyane

Bûne nokêrê dijmin
Gel didan destê wane

Di ketin pêş dijminan
Kuştin xortê Kurdane

Malê gel tapî kirin
Dijminan li ser axane

Xortê Kurdan şehîd bûn
Bûk li sûna wan mane

Axan çav ber-danêkê
Bê nikêh ew zavane

Keç û bûk dest dijminda
Leşker ket nav wane

Dest avêtin pîrekan
Namûs diçû li ber pîyane

Keçikan çav girêdan
Xwe çekirin deryane

Zendê wan sor û gewr bûn
Ketin devê masîyane

Miradê dijmin nebû
Bi canê keçê Kurdane

Bi destê ve xayînan
Dijmin ket nav malane

Gelê feqîr di kuştin
Kurdistan bû talane

25.1.1969

# E V Î N

Min xwar derbek ji evînê
Derd û kulan ji min tînê
Meh û salan ez dinalim
Lê ji ber derdê wê evînê

Barê evîn li ser kola min
Di binda qetîya sola min
Ketim xwarê ser dev û çav
Evîn xwe da ser mila min

Di bin evîn da difetisim
Nikam ji bin bilipitim
Evîn bû çîyayê zegros se
Di bin evîn da naxebitim

Evîn kete hindirê min
Dest avête wî dilê min
Meqes û xençer di destda
Avêt dil û gurçikê min

Ji dil da xwûnê xwe çekir
Lê ji hindir va derî vekir
Wekî çemê, dîcle û firat
Kef û kopik bi ser xwe kir

Bav û biran hekîm hanîn
Lê bi derba evîn nezanîn
Evîn bû agir û şehwat
Bo feqîr ket av jî nanîn

25.1.1988

## EY KARKIRE KURDISTAN

Ey karkirê Kurdistan. Dema me a rabûne.
Tev bibin welat parêz. Çi dema tine bûne.
Xebat bikin li gundan. Bi îlme zanibûne.
Dijmin dayîka me birê. Çi dema raketinê.

Hele xwe ji xwe çekin. Roja me a felatê.
Çekan hildin mile xwe. Idî ji bo xebatê.
Herkes darê ser hîvê. Em hîn diçûn liqatê.
Kedxwûr dayî birê. Namusa me li kerê hê.

Îlme karkir buxwûnin. Em bibin jîr û zana.
Vietnamê çito bir. Em rabin bi rêça wana.
Çekdarî herne pêş. Kedxwur çekin imîyana.
Bikin qîrîn keç û law. Dijmin derxin ji vara.

Ko tu ranebî ser xwe. Tim bindest û reben bî.
Dema te dengê xwe kir. Haware li serê te bî.
Wexta cenga dersime. Eceb ew kalê me bin.
Peymal kirin keç û bûk. Ewana çîke me bî.

Seba şerê jîyînê. Eme çekan hilgirin.
Ji ap, bav û birazî. Pir ramanîyan bistînin.
Bi Feqîr'ra herin pêş. Zorê dijmin derînin.
Serxwebûna Kurdistan. Şoreşger ê bistînin.

16.7.1976

## TAZI Û BIRÇIYAN

Tazi û birçîyan tev serî rakir
Bûne hêz meşiyan û azadî bankir
Dewlemend zordest dibên gel rabû
Şehetî zordestî ji ser xwe rakir

Xemla zor destan tev dibû talan
Şehetandin dewlemendî û qesrê wan
Dirivîyan ji ber karker û gundîyan
Her bijê û tim bijên karkirê çihan

Wekî karkiren cihan rabin serxwe
Bi hevra yek bin bi hêza gele xwe
Tektîk bi raman herin ser dijmin
Xwûnxwaran derxînin ji welatê xwe

9.8.1986

# DAYÊ

----

Dayê te ez anîm dinê
Te go lawê minî bi tenê
Ez didame ser sîngê xwe
Tu şah bûyî seba jînê

Te şîre beran dida min
Te go qurban lo lawê min
Roja ko ez nuxweş dibûm
Hêsir rijandin ji bo min

Şev û rojan xwe da bermin
Miz û şîrîn tev dida min
Bi salan ez mezin kirim
Jîna xwe da jîyana min

Lê dayê ez qurbane te
Ronayî û hinir didim te
Bira derdê te nebînim
Jîyana xwe tev didim te

Bav û dayîk pir şîrînin
Ji bo Feqîr hûn evînin
Min af bikin li wê derê
Rojek werê hev bibînin

16.4.1989

# P I R O Z K I N

Va îro ser sala me
Herin destê dayîka xwe
Pîroz bikin bav û dê
Bira maçkin çavê we

Bankin pir hogirên xwe
Agir dadin li nav xwe
Dinê bikin kesk û sor
Pîrozkin ser sala xwe

Def û zirnê lêxînin
Govendekê bi hevxînin
Dîlana Keç û xortan
Tev roja xwe pîrozkin

Ser sala me roja sor
Em jî bibin hêz û dor
Eme dijminan derînin
Ala rengîn hildin jor

Roja feqîr li cem dilan
Bidin hev dest û milan
Dinê tevda bibîsin lo
Ko rizgar bû Kurdistan

1.1.1988

# SEBE KURDISTAN

Hevalên Kurdan tev şîyar bibin
Bi rêçika karkir em zana bibin
Gundî û karkir rêncber bi hevra
Eme li ser çîyan doza xwe bibin

Va Welatê bav û kalê me tev da
Destê xwe bigrin rabin hev ra
Dijminan derînin ji qada Welat
Kokê li dijmin hilbikin tev da

Çekin ji erdê xwe bikin rêzan
Hun dijmin dît berdin ser wan
Karkir gundî tev rêşana me
Lê rakin şoreş ko bibin hêzan

Tim li ser çîyan em li newalan
Bombe û çekan hildin ser milan
Dijmin şehîd kir bav û kalê me
Mêr û jin mirin sebe Kurdistan

Rojekê şehîd bim seba warê xwe
Li ser min megrîn ka feqîrê me
Kurdistan bibê dewlet û hebûn
Şênayî û şadî bê Kurdistana me

12.7.1979

# ŞEVREŞÎ

Roja gul û kulîlkan
Va roja li min bû êvar

Rêda diçûm şeve reş
Herdû gavan pêşva çûm

Şeve reşe pir tarîye
Pûk û berfê dibarîye

Dengek hate guhê min
Pêra êşîya dilê min

Kirim quloç wê sancîyê
Linge min ket zikê min

Ketin xarê li ber kêvir
Ji kêşda deng hate min

Ez rabûme ser lingan
Te denge hirc û guran

Dişemîtîm ketime xwar
Diçûm navê keviran

Hirç û hovan dûzirîyan
Min xwe da ber zinaran

Tirsek kete dilê min
Min go haho pişta min

Şewqek hate çavê min
Min nihêrî û pêşva çûm

Şeva reşda dirivîyam
Tirs û xofa pir giran

Ez bi lezîn duçûm ser
Ew agirê pir li dûr

Şewqa wî agirê li jor
Çeqel dikin zûre zûr

Hîvê serê xwe hilda
Ba ew berfa kir tozan

Her der kire xirabe
Li we çolê tenê mam

Ez ban dikim tim haho
Ne dengê bira û bavo

Dayîk hate bîrîya min
Kanî xwûçik û kekê min

Destê min jî hev vebûn
Barek hate milê min

Barê minî pir giran
Nikam rabim ser lingan

Ew taqeta mine pir
Ketîyê binê bare gir

Çav gerandin li dora xwe
Çar çeqel hatin ser min

Devê wana bi xwûn bûn
Min go haho dayîka min

Dayîke birîn-darbû
Ez li hespê siwarbûm

Xarek berda diçûm mal
Gundîyan dikir gale gal

Girîyan haho dayîka me
Bav,go rabin xortê me

Tev'da em rabûn ser xwe
Pir çê dibû hêza me

Feqîr digo bi tektîk
Ku dijmin bidin ber xwe

Ji dijminra gorîstan
Li nav axa gelîyê me

5.5.1982

JINA INSANAN

------------

Ez bi çûk bûm
Pir şîrîn bûm

Deh salan da
Xezim û dîn bûm

Ketim panzdan
Şanzde salan

Lê bi zîn û zengû bûm

Bist û çar da
Xwudan jîn bûm

Him zana bûm
Xebat kar bûm

Xwudan şan
Reng û dîn bûm

Dewlemend bûm
Navê min hebû

Bîst û heşta
Sermîyandar darbûm

Sî û penc da
Çel û çar da

Ez hakim bûm
Di penceyî da
Bi hinir bûm

Pence û penc da
Zer û pîr bûm

Di şêstî da
Bê derî bûm

Şêst û penc da
Bê xwudî bûm

Heftê û penc da
xerifî bûm

Di heştêyî da
Ser min şîn bû

Hawar û qîrîn û girî bû
Di nodida axa sar bûm

# NUH-ROJ

Pûk û serma dawî hat
Bilbilan dengê xwe hat
Germê xwe da ser welêt
Keskayî bi rû erdê hat

Çol û banî tev kesk kir
Mor sinbil serî hil kir
Kulîlkên çîyan û feyîdan
Gewr, zer û sor hêl kir

Hat va dema lê av dare
Pez tev duçûn li zozane
Bîs û yekan dest pêkir
Def, zirne û li bazdanê

Lê ew dehaq dîn û har
Mêjê zarokan tev xwar
Kawa dest bi şoreş kir
Cîhan tev di bû bi-har

îro cejna me Kurdan
Pûk û serma paşva man
Me cejneke nuh çêkir
Kawa li ser Kurdistan

Feqîr dem çû lê îro ma
Em jî rabin ser lingen
Kund tev bibin hêz û yek
Ko em bibin tev Kawa

21.3.1969

## 1 GULAN

=======

Roja yekî gulan hat
Karkêr berda tev xebat
Dinê li hevdi kombû
Karkêr rabin roja me hat

Tu kes nema li xeraban
Li ziqaqan li ser banan
Gundî dest dane karkir
Dijmin rivîya ji meyîdanê

Cejna karkerên cîhan
Tev kom dibûn dicîvîyan
Dewlemend û sermîyandar
Gîşkî ji wan di tirsîyan

Cejna yekî gulan xeş
Gul û gupik tev bûn geş
Belengaz tev da rabûn
Hinber dijmin kirin meş

Feqîr rakir ala sor
Das û balyoz dane dor
Tev rakirin kulme xwe
Roj hilat bû siba sor

29.4.1981

## DEV-KEN O ZIK-DIR

Dijwar, reben, bin dest û birçî
Dev-ken, bê mal, nezan û reşî
Derewçîn, zik-dir bê hiş û mêjî
Li çolan digerî wek mar û jûjî

Dîroka te reşe sipî tewr tune
Serîda mêjî heye hişê te tune
Bi zirtî zanabî tu nabî însan
Tu li dinê heyî navê te tune

Dest pêka Kurdan îro jî werga
Derî vekirin dest ji war berda
Xwunda, axa, olparêz û dewlemend
Civîn çêkirin tim bi hev veda

Serbestî, azadî ji gel ra tune
Mahcir, belengaz tim wekî tene
Ji xwe bipirse çima tu werga
Lê Welat çêkirin warê te tune

Li te peyda bû ew derdê giran
Lê çima nagerî li dermanê dilan
Şîyar û sanabê xwe çekî ji erdê
Ko tev xebat bikî tu wekî biran

Rûnî li ser nan heta çend salan
Lê hebûn tunebî wek darê qirşan
Bendekek kepek tu mexe fazle
Şehîd û navdar. Tu bijî li cîhan

Metirse tu mirî lê narî ji cîhan
Navê te jîn bibê tev sala danzda
Kelhor, Lor, Gor Kurdmanc û zana
Bi xwe zan. Bûn netew. Lê niha raza

2.8.1974

## SITIL DIKELE SITIL

Sîtileke mezin li ser sê kuçkan
Ezing û komir tev dane bin we
Şewq didê ,pêl daye ew agirê gur
Dikelê dikelê dikelê Sîtil dikelê

Kelebox rabê bi riman bilind
Xwumîna wera şênî tê ji gund
Zarok û şênî tev li dora Sîtil
Sîtil biteqê hilwaşînê gund

Sîtil dikelê çi têde nazanin
Zaroke birçîne şênî xizanin
Xwe dane bere bikelê buxwûn
Sîtil biteqê tev'da bimrin

Min bankir haho ji ser balabin
Sîtil biteqê însan tev bimrin
Dengê min neçû ji dengê Sîtil
Şenî û zarokan ji ser birivin

Ber çavê min Sîtil pir mezin
Agir bindê pir dikê xwûm gun
Pelqan davêjê ew agir û şewat
Zarok û şenî tev dikê bimrin

Tim qîrîn bi min haho û gazîn
Hûn û zarokan tev'da birivin
Guh nadin ser min dorê narin
Dayîk, birazî tev kur û bavin

Min girt zarokan haho bimeşin
Gelî li dor me tev'da dirivin
Xwe avête çeman , golan avan
Sîtil diteqîya însan tev dimrin

Nalîn, şewat û dengekî dijwar
Li ber pîyan çû .mal, kon û war
Şewitand çiya, dar zinar û newal
Cihan dinalîya ji denge dijwar

Ji dengê Sîtilê tev ker û gêj bûn
Pir di avêda man rojekê û duduyan
Cihan tev mest kir kêm dibû nalîn
Gişk rabûne ser xwe ji ava şîrîn

Rivîyan malan û tev dibû bangîn
Xal, xaltî, zarok û birazî nedîn
Nalîn, şewat, mirin,qîrîn û girîn
Xirabe bû, talan bû ew jîn û evîn

Şènî li dinê tev zar û bê mal
Ne war, ne kon, ne milk û hal
Perişan, birçî, ne xwarin û nan
Pir werga diçû roj, meh û sal

Tev'da bûn hêcir bi çolan ketin
Ji hevdi belabûn û tevda raketin
Çeqel û guran xwe dida ber wan
Ji tirsa çeqelan tev bi hev ketin

Tev ketin xwar li navê dijwar
Barêkî giran bi serda hate xwar
Bodle bûn kî dimir bê hal û reben
Li me nebû havîn, payîz û bihar

Pûk, berf, baran, serma û bahoz
Bi çolan ketin xwe nekirin koz
Li dinê belabûn wekî qereçî
Dijmin belakir, gişki bûne toz

Çêkirin komi bi yekî û dudîyan
Bûne dijminê hev ji tirsa guran
Hev kirin mîxbîr, ew mît û ajan
Pêmal bû, talan bû gelê Kurdistan

24.12.85

# ÎRO LI KURDISTANA ME

Îro li Kurdistana me
Dijmin pir hat serê me
Gundî, şênî û tev bajar
Hilwaşandin li serê me

Şerjê kirin zarê bi çûk
Pêymal dibûn keç û bûk
Pîr û kalên me neman
Em tev'da bûne pêpûk

Şehetandin mal û kon
Ew şêrên me li kur man
Em bûn hêcir û macir
Çima bi xwe ne hisîyan

Gelê cîhan war çêkir
Em jî mane bexte reş
Berdan bi çolan ketin
Gel davêtin koxên reş

Kar û xebata me gîyan
Ne ji boyî Kurdistan
Me xwe avête derva
Gelê me ma bin destan

Rabûn bi feqîr vedan
Berîyê gel dane çolan
Hîn jî dibên bi dest me
Ka şoreşa Kurdistan

25.1.1982

## Hêz Dikim

Hez dikim li hêz bikim
Deste xwe jî li badikim
Tiving didim ser milan
Bi dijmin ra şerdikim

Di şer da tim wekî şêr
Dijminan tev dikim ber
Ez û dijmin di şer da
Cîhan li me dikê ser

Pir dikujim di mirim
Bi şeref ez tim bijem
Nabim kole tu kesan
Eze dijmin bu kujim

Him bikujim hez bikim
Dijmin Welat der xînim
Ala mine bi çar rengan
Bi ser gelda li ba bikim

Welat bi serî û dev be
Pirî zer û bi maden be
Gundê me feqîr tevda
Endam û bi ser Firaz be

6.5.1987

# J I  M I N  S I T A N D I N

Çav vekirin min li cîhan
Ez digerim bi şev û rojan
Bûm perişan û belengaz
Xelkan çêkir al û dewran

Ketme xware hatin ser min
Pêle minkirin hirç û hovan
min got haho cîhan dibîst
Ez kirim peyîmal û talan

Didane min ramanîya xwe
Ez bûme dijmin ji bo xwe
Xeml , war û ala min xeş
wan sitandin kirin a xwe

Ez bûm xwudan tizbî û xist
Pir dijminan li min dixist
Ko ez serî li xwe hil didim
Dişkenastin li min ser û pişt

17.5.1980

# PARA GELI TE TUNEYE

Welate me pir mezine
Dewlemendîye li ser û bine
Dîcle û firat hûn binêrin
Para gelî tê tuneye

Dîroka me pir bilinde
Petrol xwe çedike ji bine
Erbîl û batmane binen
Para gelî tê tuneye

Ser erdê me pir fereye
Dijmin kirê deste xweye
Zêrzewat, ceh û genim
Para gelî tê tuneye

Kedxwur kirin welate me
Xwayîn bûne nokêr li ser me
Ketin Pêş leşkere dijmin
Kuştin pelçiqîya gele me

Dêrsim çito berdar kirin
Zarok hemû şerjê kirin
Min go haho bira kanî
Xwûşk û bira sax tuneye

Cenga xwe dan kuştin mirin
Meyît û cenaze kom kirin
Me tev çû li mayîtan nihêrî
Meyîtê xwayînan te tuneye

Dirok rê ji mera tînê
Xwayînan çi kir duxewînê
Geli çekên xwe rakirin
Sînge xwayînanda da tînê

Gele me rêça xwe danî
Bi hevdira bawerî hanî
Va xwayînê Kurdistanê
Bi dijmanra tevayî danî

Gele me çêkir rêça xwe
Deste xwe xîne dayîka xwe
Seba namûs xwûn dirjînê
Xwûna xwayîna te tuneye

Feqir çû ji dest xwayînan
Axa û beg hemû li cem wan
Dijmin al û war çê kirin
Began qûna xwe kir ber wan

13.6.1969

## BERDIN BI HÊZ SERÎ HILDIN

Dîsa dijmin hate ser me
Mirin bû şaxa dile me
Hestê kevnar tevda nuhbûn

Berdin bi hêz serî hildin
Mêran û jin Welêt bigrin

Çiqas sale em tim bin dest
Talan û hêsîrên zor dest
Didan pêş me kevne perest

Hindik bi hêz serî hildin
Mêran û jin Welêt bigrin

Pîrek û xwûşk bi me zorin
Gulîyê keç û bûkan morin
Bin destên leşkerê dijmin

Bigrin haho bi hêz rabin
Mêran û jin Welêt bigrin

Çi dewrane em tê dane
Esrê me ketîyê bistane

Cîhan tev darin sitêre

Memrin bi hêz serî hildin
Mêran û jin Welêt bigrin

Karker rabin bigre xwûşkan
Di zeft û geftandan êşîyan
Ku em bimrin tev şehîdin

Rabin bi hêz serî hildin
Mêran û jin Welêt bigrin

Şermê tev destan nadin hev
Namûs bi me gotin bi dev
Çê bûn serok tev ji bo hev

Berdin hi hêz serî hildin
Mêran û jin Welêt bigrin

Dayka me bin destê dijmin
Hîn gal gal û lefan dikin
Ne şerm ne ar û tim zirtone

Berdin bi hêz serî hildin
Mêran û jin Welêt bigrin

Te nalîna xwûşk û biran
Ew berxik û karikê dilan
Ketin devê kûçik û guran

Bi qîrîn kin serî hildin
Berxan derxin ji devê guran

2.2.1980

## AX PİŞTA MIN

Şeve reş tarîyê diçim di rêda
Çalî ling ra çû xwûn darê ano
Kûçûk û hovan gazî min kirin
Min bigrin bixwun bi mingê bavo

Tirsîyam û rivîyam rê talî neye
pişt xwe nihêrî ew hova zû teye
Dengek hate guhê min go lawo biriv
Xwe bi me gînî lawo va mala meye

Rivîyam, tirsîyam, şemitîm û ketim
Bane we malê kir min go ez hatim
Kesek derneket ji hindir wê malê
Min go ax pişta min çima ez ketim

Janê xwe berda dil û gurçikê min
Sîqîna feqîr ra kes tune li dor min
MIn dî şefaq'ra rojê xwe çekir
Gelî kar berdan tev hatin ser min

11.12.1971

## SALA BEŞÎKÇÎ PÎROZ

Hezar salan derbas bê
Kurd pîroz kin bêşîkçî

Eme rîya te nas bikin
Pêşva biçin bêşîkçî

Zana û hunuran çêkin
Şewqa te da bêşîkçî

Gel'lî kom kin yek-gerkin
Di Kurdistan da bêşîkçî

Yek raman û yek-dest kin
bi hirmijin bêşîkçî

Eme herin ser dijmin
Cengê bikin bêşîkçî

Him bimirin, bistînin
Bijî Kurd û bêşîkçî

Eme dijmin derînin
Bêjin rêça bêşîkçî

Ala-rengîn hildin jor
Di şewqa te da bêşîkçî

Tev da şahî û şayî bê
Cejna gelê bêşîkçî

Ko Kurdistan rizgar be
Bijê serok bêşîkçî

Şaristan û maristan
Bi Cîgerxwûn bêsîkçî

Em sîstemekê deyînin
Di şewqa te da bêsîkçî

Di kesk, sor û zer da
Binivisînin bêşîkçî

Şaristanê Kurdistan
Bi heykelê bêşîkçî

Firok û balefirgehe
Him Cîgerxwûn bêşîkçî

Dinê werin bibînin
Va welatê bêşîkçî

Kurdistan kesk û sor bê
Bi ronayî bê bêşîkçî

Em feqîr rên Kurdistan
Di rêça te da bêşîkçî 30.12.1988

## HUNIRAN BIDIN MIN

Çend Salin li ser te kar û xebat
Navê te ji min ra bû jîn û felat
Serî dan dijmin wek hewal qubat

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Eme rojek herin serê çîyayê xwe
Dijmin ra deyînin darê ceng xwe
Huniran bistînin ji wî gelê xwe

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Destan bidine min li nav berazan
Eme hêze xwe kin tev bibin hêzan
Hunirekî bistînin ji qata xizan

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Te xwe xemilandê tev da boyê gul
Xwe berda hindir tev kezeb û dil
Eme bidin hevdi dest, pişt û mil

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Ko em bi hevdigên tev da bibin geş
Lê ko negên hevdi gelîye me nuxweş
tev huniran çê bikin ji dîwana-reş

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Li bejna xwe danê kesk, sor û gewr
Xwe li hew bigerînin bira bibê şor
Hunir bidin hevdi bibê mij û ewr

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Tu destan bidî min tim biçin şoreş
Ava çem û kanîyan çima bi me xweş
Lê hunir bidî min ko em bibin geş

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Tu destan bidî min biçin ser avê
Tiving li melê me rext werin navê
Lê hunir bidin hev ji kal û bavê

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Xeber bidin şerefedin mîrê dîwanê
Topê lêxê li tirk û li erebistanê
Xelaskê ji me ra tev Kurdistanê

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Destan bidî min li dêrsima rengîn
Kort û keçê me tev dikin bangîn
Huniran bistînin ji zeynel-abdin

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Destan bide min li çîyayê qoçkêrî
Zîyaret kin Ali-Şêr Delal û mêrî
Em hunir bidin hev ji pişt û sêrî

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Wun destan bidin min biçin rihaye
Tev avê vexun ji wê Enzil-xwaye
Lê hunir bidin hev ji we dergaye

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

Mabênê min û teda tev mij û dûman
Şîqîna birûsk û gurminîya ewran
Azadbî Kurdistan feqîr bê xwudan

Huniran bidin min leşkerê we me
Şehîd û bistînim ser rîya te me

3.2.1971

## ROJA SOR DA KURD HENE

Cîhan ji mera kurdê sor dibêjin
Rêça gundî û karkiran da em hene
Pir salin dijmin kete kurdistan
Tiving bikşîn dijmin derîn em hene

Welat em bi dest xwexînin we rojê
Yek raman kin xwe çekin li cengê
Di bin axê da xwûna mêrovane sor
Bi çek-darî pêşva herin kurd hene

Xort, kal, pîr û bûkan bi hevgînin
Hevra yek bin serxwebûnê bixwazin
Ji Sêwas da Kermanşahê bistînin
Bi dijmin ra cengê bikin em hene

Xewê rabin piştt û destan bidin hev
Cengê bikin seba ko bibin tev dev
Av rû bikin li ser axa Kurdistan
Di dest xwe kin di ve rêda em hene

Feqîr bankir ala-rengî bikşînin
Ji dinê ra name û lewcan bişînin
Gundî û karkir tev bikin dest xwe
Kurdistana sor çêbikin kurd hene

3.4.1968

# TEV HILWESANDIN

---

Kurdno şîyarbin tev bikin gazî
Binêrin dijmin ji me çi dixwazî
Va dema meye destan bidin hevdi
Dijminan bikujin xwe bikin serî

Kanî kî hîştin em teve li kurin
Pir zindanada tev surgûn birin
Ji hevdi belabûn li çolan mirin
Mal û milk nema tev talan kirin

Li ser Kurdekî sed leşker danîn
Hindir malê meda qereqol danîn
Le namûs nema bi leşkerê dijmin
Bê mal û talan bûn çima nabînin

Tev kuva tînin leşker û qomend
Lê hilweşandin bajar û tev gund
Didine pêşe xwe keç û zarê Kurd
Xelk baz û şehîn lê em bûn kund

Pir kesan dibêjin emin şoreşwan
Şoreşger gîşkî bi namûsê dimrin
Bin destê dijmin xortê mê cîwan
Namûsa Kurdan ketê destê dijmin

Lê nê pêş çavê we gelê filistîn
Rabûn ser linga dibên serxwebûn
Bi dest xwe xînin al û ware xwe
Em wanî herin tev bibin tunebûn

Lê kirin nav me ramanîya dijmin
Nikan deng bikin ji dest dijmin
Ko li dijî dijmin têkoşîn didin
Li hinber wayî tev dibin dijmin

Ji boloda şandin qomendo ser me
Dijmin dikujê  kek û xwûşkên me
Hîtlerê feşîst pir kuştin însan
Em bûne binbar dijmin li ser me

8.5.1981

## D I L E  B I  K U L

Gulî û keji te bûne kanî
Çavê te bi kile sib-hanî
Te ji mira pir derd dihanî

Lê milkê ez birîndarim
Xemla min ez perîşanim
Ji bo te ez evî darim

Evînan dilê min qul-kir
Şax û şopê dinavd vekir
Navêda xwûne xwe derkir

Lê milkê ez birîndarim
Xemla min ez perîşanim
Ji bo te ez evî darim

Dilê min bû çav û kanî
Tu bûyî sebeba vî dilî
Ez ketim rêça bîyanîyî

Lê milkê ez birîndarim
Xemla min ez perîşanim
Ji bo te ez evî darim

Por û gulî te tevda berdan
Feqîr bû xwudê pir derdan
Tu ketî nav deste çendan

Lê milkê tu Kurdistanî
Xemla min ez perîşanim
Ji bo te ez evî darim

4.10.1965

## AXAN ÇIKIR

Axan li me çi kirin
Derî li dijmin vekirin
Bûne nokêrê dijmin
Milkê gelê me birin

Li me xistin firotin
Dijmin li me hêvotin
Ser erd û bin erdê me
Gîşkî dijmin ra gotin

Dijmin hanîn mala xwe
Raberê kir jina xwe
Dijmin go axa sen çix
Kêf yaperim bi jina te

Axa go olmez başim
Bu benim helal daşim
Qiz qardaşim orde war
Gidin onla sewîşin

Dijmin li axan dida dar
Dest girêda li ber dîwar
Di hindir mala axê da
Li hustî jina wî siwar

Lê namûsa axê çû
Mala xwe tev bela bû
Nema bikê nokêrê
Pergala xwe bela bû

Axan tev bûn bextê reş
Ew kêmasa ji wan ra xweş
Di nav gel da bûn gewad
Çûn serê çîyan bûn keleş

Çûne cem şoreşwana
Go em têne ji xwanan
Ko hun me qebûl bikin
Li ser çîyayê Kurdistan

Axa tev dane dora xwe
Tev didan sozê xwe
Sir nedane wa axan
Lê pê kirin karê xwe

Xebat kirin bi roj û şev
Pir feqîr kirin tev hev
Bûne hêz û yek-destûr
Ew û dijmin li hinber hev

3.8.1966

## MENALIN

--------

Ey mileto rabe ser xwe
Di bin lingan da menale
Binên dinê darin hîvê
Dest û lingê xwe vemale

Hevdi kom bin çekin civîn
Destan bakin bikin qîrîn
Hêza mezin bi gelê xwe
Wa sere çîyan bikin hêlîn

Xwe bi hêz kin bi enî kin
Bi raman û yek destûr kin
Eme herin ser xwûnxwaran
Ceng, şer û ber-berî kin

Eme tev li xwûnxwar xînin
Ji warê xwe bi qewtînin
Eme tev çêkin komera xwe
Gelê feqîr bi hevdi gînin

19.11.1988

## AXAN Û BEGAN

Axan û began em xwarin hevalno
Pelçiqîyan, mirin bin destê wano
Dewlet û hebûn ji me distandin
Kirin bin lingê dijminan gîyano

Werin em bikin tev ramanîya xwe
Çekan hilgirin bi hêza gelê xwe
Va xayînana em kirin bin dest
Çekên xwe bidin ser sîngê wane

Deşt û newalên me tev zêr û zîvin
Leşkerê dijmin li ser û dilîzin
Mêrg û kanîyê Kurdistan pir xweşin
Welatê xwe rizgar bikin hevalno

Gelê dinê pir rizgar bûn birano
Sebe mafê xwe mirin pir hogirno
Koletî bin destî pir şerme ji mera
Bi çekdarî mirin xweşe hevalno

Feqîr'rê Kurdistan hevalê webê
Serê çîyan bikin dest xwe birano
Bi jîranî bikin şer û cenga xwe
Eme welêt rizgar bikin hevalno

13.12.1978

## KOLEDARE QEBUL NAKIN

Rabin ser xwe tev bibînin
Emerîq, îngiliz û alman
Dinê bi zincîr girêdan
Sermîyandaran sitêr didîn

Dema rokêt û pir fîzane
Ji emerîq davên hinde
Dinê tev kirin destê xwe
Ceng û lêdan li filistînê

Lê-dan, mirin û kuştin
Li ser qata belengazan
Her der dikin ceng û xwûne
Xwudîyê fîzan û va rokêtan

Feqîr'ran tev serî hildan
Li hinberî va zor destan
Him dimrim pir dikujin
Koledarê qebûl nakin

8.1.1988

## ŞOREŞGEREN QEHREMAN

Va tev hêza roja giran
Dengê top û balefiran
Xortê Kurdistanê cîwan
Hêza xwe dane serê çîyan

Feqîr duçûn dora wan
Ewana bûne qehreman
Darê Ala xwe hildidan
Bûne enî li Kurdistan

Hinir û hêza yek-destûr
Pişt dane hev didîn dûr
Bo azadê û serxwebûn
Sîngê bi pirç kirine sûr

Şoreşgeran çûn ser dîyar
Roj li dijmin dibû êvar
Pir qomendo li Kurdistan
Ji dijmin ra bû goristan

Orda dijmin hate ser wan
Berê xwe nedane çolan
Ceng û şer tim ber-berî
Dijmin dirivê ji ber wan

Xwe tev dane ber dijminan
Lê şoreşger bûn pehlîvan
Lê wana bi xwûna xwe sor
Tev bûne xwudê Kurdistan

4.89

## EZIM KURDISTAN

Ezim karkirê Kurdistan
Ezim pêşverû
Ezim şoreşwan
Ezim ser çûn û ber çûn
Ezim leşkerim
Li jêr tim xas û tezî
Ezim birçî û be malim
Bin destê dijmin

Lê ezim gel peres
Ezim xwudan gel
Ezim li ser çîyan
Tim dikim qîrîn
Ji destè xwûnxaran
Xwe bikim azad
Ku ejî bijî`m wekî insan û gelan

Dema ez parçebûm
Bi destê dijmin
Gele min nezan bû
Ketim bin lingan
Çend caran min serî hilda li xwe
Hêza min bi çûk bû
Tev bûm perîşan

Dijminan pir kuştim
Xwûna min vexwar
Li her alî min
Diz, dijmin û qelaş
Va xayînê Kurdistan
Ez tev difirotim kedxwuran
Çandî û dirok ji min distandin

Bi ser min xistin
Ew ala xwe`ê pîs
Pêymal û talan bû
Mal û konê min
Bi nokêrê dijmin
Begên Kurdistan
Pelçiqiyam, ketin disa rabûm ser lingan

Min danîyê pêş xwe
Ramanîya karkir
Tev çekirê dûre
Ew tizbî û xişt
Ji min ditirsin
Dijminê xwunxwar
Rojhilata navi ku bikim bihişt

Ew ramanîya kevnar
Min pir paşva hîst
Bi tektîk û hêz
Darim bi ser û pişt
Ew kedxwurwan zanin
Ez pêşva tême
Teror û qetliyaman li min çêdikin

Ku ezin Kurdistan
Lê netewa bin dest
Hûn rabin ser xwe
Tev qata bin dest
Li hinberî dijminan
Deynin yekîtî
Min û xwe xelaskin
Ji qata ser dest

Ez zanim Marxsîstê
Ku çe bikim bi xwe
Wek-hevî deyînim
Ezê li ser xwe
Netewên bin dest û karkirên dinê
Bi hevra şah bibin
Bi navê min û xwe

Ez ne anarşîstim û xwe nadim dijmin
Ez ne feodalim ku gel bi-firoşim
Ez nabim irqçi ma xwûna ke dimijim
Ez xwe înkar nakim çima bitirsim

Ezim Kurdistan
Tev çiya û zozan
Ezim xwudan gel
Va ezim bi raman
Va ezim pêşmerge
Di nav kêda tune
Karkirên Kurdistan
Ezim rêça karkiran û ezim sanzûman

Li her alî min
Dijminê xwûnxwar
Bandikim haho tim gelê dinê
Ereb, fariz û tirk
Tev`da tên ser min
Dixwazin ji dinê rakin navê min

Ne bese li ser min
Qetliyam û kuştin
Ew kesên çepok dijminê karkir
Bi lekan û dûbaran
Min înkar dikin
Nikanin xwe bikin vê rêça karkir

Hinek oportonîst
Lê hinek zirtone
Bi teqlan û hilan
Xwe dikin zane
Xebat nakin û xwe înkar dikin
Wekî dijminan tev tên ser min

Vaye min vekirîyê
Ramanîya karkir
Feqir û bin destan
Tev`da li pişt min
Bi hêz bi raman
Xebat geş bikim
Bistînim Kurdistan bibim sosiyalist

18.3.1982

# KURDNO

Mahcir û bin-destê dijmin
Em ji xewê rabin Kurdno
Li ser me tim pêta agir
Va şerme em rûnin Kurdno

Gellî serê xwe berda jêr
Perîşan, bindest û bêkêr
Dijmin çekir fîze û roket
Davê ser me dimrin Kurdno

Em rabin ew gel şîyar bê
Ma nabînin bombe li ser me
Bê kefen tev ketin gornan
Em çima ranabin Kurdno

Destê me çû gel û komar
Ka dubistan û xwandeger
Tazî, birçî netew bê war
Gereg em biteqin Kurdno

Werin em rîya hev bibînin
Lê ne bi çûk ne pîs dibin
Bi ramanî rakin bomban
Werin tev herin pêş Kurdno

Em û dijmin tim bikin şer
Sîngê bi pirç tev bidin ber
Em şehîd bin pir bi kujin
Gereg em netirsin Kurdno

Rabin ser xwe bankin dinê
Ne çavî li pûştîyê û nan be
Dijmin ji qada xwe derxin
Ko em jî bi dev bin Kurdno

Beg û mîran em firotin
Dijmin li me tev hêvotin
Girtin dane dest dijminan
Em kuştin, pelçiqîyan Kurdno

Dem li me çû havîn bihar
Bi namûs, şeref û hawar
Xwe mekin rûreş û nokêr
Ko em nebin înan Kurdno

Werin em herin serê çîyan
Ewê hatî Feqîr bi qurban
Bidin mal, milk û tev can
Ko Welat rizgar bê Kurdno

25.1.1989

## Ş Î Y A R B O N

Em kurd şîyar bûn pîroz
Çîya û zinar li me pîroz
Dema destan bidine hev
Yekitî li Kurdan pîroz

Bi zanistî pir sazkin
Bane hêza gundîyan-kin
Ji karkiran yek serok
Va seroka li gel pîroz

Hêza mezin tev yek dev
Gundî û rêncber bigêne hev
Du benî tew çê nebê
Ew çê bûna li gel pîroz

Xebat bibê bir roj û şev
Bawer bikin gîşkî ji hev
Ji Kurdistan yek tev-ger
Ew tev-ger'ra li me pîroz

Roj û şevan yek tev-ger
Emê bibin ser leşker
Tev da destan bidin hev
Tiving û tang li me pîroz

Tev-ger bikin wekî mar
Li her derê bibin şêr
Bi Feqîr ra herin pêş
Kar û xebat li me pîroz

24.12.1976

## M U J O L I M

Rojek tev ketim nav xeman
Pir mujûl bûm sal û mehan
Hat serma pir pûk û baran
Lê hilwesand kon û dewran

Gelî tev da bi avê da çûn
Kon û malan ser hevdi çûn
Haho,qîrîn û tevda bangîn
Dem û dewran bi hevra çûn

Mirin,kuştin tev bû talan
Lê tev dibûn wekî mirîyan
Ne sal ne meh ne bû bihar
Kurd ketin destê dijminan

25.1.1972

## HİŞÎYARÎ

Kî mêr xwaze û kî egîte
ew dil xweş û pir zanaye
ew xwe çekê nevê gelî
ecebi gelê me çi bêye

Ko em tev da bi zanabin
destan bigrin hevra rabin
em dom bikin tev xebate
seba dijmin ji vir rakin

Rêçeke pak û baş çê bikin
xwe ji xewê bi riman çekin
em pir gel bidine dor xwe
seba dozê bi serî bikin

Dîroka me pir mezin bû
tev bajar û gîşkî gund bû
şerme kedxwûr li ser meye
tev da rivîyan li gelî çi bû

Axa û began tev rakirin
gele me ji hev bela kirin
dijmin danî ser serê me
welatê me talan kirin

Divên em tim serokê we
 wana bûne dijmin ji boyî me
  pere li dor wan namînin
   ew dirivin tenê cem me

Çend gundî li dora wana
 bi xwe wekî marxîst zana
  pir duxwûnin tev dibêjin
   dibên karkir nabine zana

Karkir ko dengê xwe dikin
 îblîs wana awar dikin
  karkir tev da welat parêz
   ji mafê welat sar dikin

Hidî karkir narê nav wan
 ew dibêjin gelî ji axan
  ko karkir radibê ser xwe
   dibên vana gî bûn ajan

Feqîr dibê vaya wanî
 wan ji boyî xwe kire gazî
  bûne neçîrwan ji bo hev
   ji gel ra hanîn belengazî

1.4.1981

## QATA BINDEST

Ey însanên. Tên û darin ji cîhan
Rastî xebat bikin tev wekî biran
Bi fen, dolap û qelêsîya pir gir
Tim qata bindest reben û perîşan

Karkirno, gundîno tev'da belengaz
De rabin ser xwe mafê xwe bixwaz
Ewê bi me dilîzin ne ji qata mene
Ew zengînin. Em birçî û belengaz

Zanistî a wane. Em nezan û bê hiş
Ku kî diqeherê. bi mera dibên kiş
Em kirine mirîşk. Bi xwe bûne dîk
Ewana bi me dikin. pir tiştên pîs

Li dinê em rezîlin û ewana serok
Ew emin çê dikin ew top û firok
Ew bi me dikujin tev qata bindest
Çima bindestî xwe bi xwe bikî serok

Feqîr û bindest tev'da li cem te
Lêxe, hilweşîn tev qata ser dest
Mal û ala wana tev bistîn bi zor
Hinir û zane bûn dibê a min û te

28.5.1984

# ŞEWÎTANDIN

Were megrî dayîka min
Agir berda dilê min
Ez berê dil birî  nim
Megrî megrî dayîka min

Megrî hêsran rêj meke
Derd û kulan pir meke
Zarê me tev şewitîn
Dilê min xerab meke

Hatin ser min dane dar
Şewîtandin mal û war
Bûne mahcir li warê xwe
Dîsa di bin destê neyar

Lê dayê bi hesreta te
Eze werim li şopa te
Dest û lingan vemalim
ko bibim hêz sebe te

Bibim hêz û yek destûr
Dest, piştê û bibim sûr
Eme herin ser xwûnxwar
Ji warê xwe çekin dûr

Em tev çêkin warê xwe
Fîza, firok û ala xwe
Bira dijmin bitirsin
Ji gundî û feqîrê me

10.10.1988

## WELATE ME KURDAN

Welatê me kurdan pirî mezine
Mêrg, kanî gul û hemû zevîne

Gele welat tev da gundîne
Eme herin bikin şerê jîyîne

Welatê me kurdan kanîya zêrane
Ketê bin destê dijminan gîyan

Keç û xortê me tiving mil dane
Eme welat derxin li bin destane

Eme bi qîrîn kin jorda werin
Wekî vietnam xwe li dijmin xînin

Erd û ezmên hildin tev bihizînin
Welêt bi zorê ji dijmin bistînin

27.6.1968

## GELÎ RAKIR ÇAKÛÇ Û DAS

Xewa giran ez şîyar bûm
Çîyayê axrîyê koç siwar bûn
Germa havînê di hirmijî
Av tunebû ez bê hal bûm

Bangîn kete kar û berxan
Zarî û zêçan berda girîn
Şîqîn kete gelî tevda
Av tunebû li hev hevilîn

Xwazî kete qirka min
Germa havînê pir hirmijî
Gelî tevir û bêr rakirin
Li erdê xistin av pelqijî

Çar kesan go roja we baş
Lê çi dikin li kermekaş
Lê gotin avê ve mexun
Gelî rakir çakûç û das

Bû çerqîna tevr û beran
Gundî, feqîr tev da biran
Hinek kuştin hinek rivîyan
Lê Rizgar kirin Kurdistan

27.3.1981

## HERDU HOSTÊ LI CÎHAN

Herdu hostê li cîhan
Pir karkirin xebitîn
Karkêr bi hevra rabû
Dewlemendî perpitîn

Hêza bi çûk gir kirin
Li hinberî zor destan
Hilweşandin çarê gir
Bijîn karkerên cîhan

Ser bilindî pir giran
Divê çêkim pir biran
Bi tektîk û bi raman
Bandikim tev karkêran

Bi ramanî herime wan
Lê em bibin şoreşwan
Sîngê xwe bidin gurlan
Ko bistînim Kurdistan

Roj û şevan bikim kar
Wa gundî lê xebat kar
Xebatê bikin dest xwe
Rakin ji welat neyar

Wek-hevî du xwazîya me
Lê feqîr rabin ser xwe
Tev da rakin ala xwe
Kurdistan tev da a me

25.1.1982

# E V I N A K A R K I R

Li Kardistan min kar dîto
        buşuxulim way way

Karker hatin di Kardistan'da
        em şuxulîn way way

Yeke têda pir lewend bû
        bi minra gotin haho

Ku vegerîyam çavê min lêket
        ez xerbilîm way way

Ez rakirim ser doqtoran
        û va hekîman way way

Birîna min avêti bû
        herdû dilan wax wax

Hekîman got birînê te
        ne a dilan law law

Werge tê bimrê herê
        ji ber evînan law law

Min go doqtor evîndarê min
        tu nas bikî wax wax

Ew şebaba niha ketîyê
dest kedxwuran dost dost

Ez dizanim nisaxî min
ne a dilan doqtor

Seba rindê me winda kir
bav û bira doqtor

Gîşkî rabûn bi ramanîyakê
gotin çîye wax wax

Va Feqîr'a şewîtî miro
li hêvîya vêye dostno

Gîşkîyan femkir gotin
Kurdistan'a rengîye haho

14.19.1974

# KEÇA BERAZAN

Keçê tu serê siwaran
Rim nakevim çiwalan
Keçik gewûn sor û ser
Ew ji desta berazan

Taca zîvîn li serê we
Îbêdê û gulîye yarê
Ew kenbera zêr û zîv
Girêda li piştê û navê

Kesk, gewr sor û zer
Xwe kire ala gehwer
Bi ser xwe da direşand
Bîna miskê tev da enber

Yara min li ser kanê bû
Çavê min li bejna we bû
We ez xwarim perpitandim
Ala rengîn li bejnê bû

## MIN HEVAL NASKIRIN

Iro min hevalê xwe nas kirin
Hidî min şoreşger nas kirin
Hevalê min di roja pir teng
Min hûn nas kirin lo hevalno

Hevalê min ji boyî welat
Boyî namûse dikine xebat
Hevalno lo lo hevalno

Hevalê min can û dilê minin
Hevalê min reşika çavê minin
Hevalê min hevale doza minin
Hevalê min evîna dilê minin

Hevalê min ji bo welat
Bi ramanî dikirin xebat
Hevalno lo lo hevalno

Derîyê teng û zinarê pir reş
Em we xelaskin bi gelê me xweş
Hûn seba welat têda dinalin
Ez li derva ji bo we nuxweş

Hevalê min ji bo serkeftin
Ji boyî rizgarê û azadîye
Pir şehîd bûn ji bo kurdistan

Hevalê min ji dijmin natirsin
Hevalê min tewr nene firotin
Hevalê min bi gelê xwe bawerin
Hevalê min zeft û geftê dibînin

Hevalê min dixwazin fîrazî
Hevalê min ji boyî azadî
hevalê min dibên ser bestî

Xwe ji bo welat tev kirin feda
Nokêrê dijmin wan axa û began
Pêşa dijmin da li me digerîyan
Heval di hindirda bi destî began

Hevalê min dijminê axa û beganin
hevalê min dijminê xwûnxwara gîyanin
Hevalê min dijminê koledaranin

Ez xwe bidim kustin ji bo hevalan
Yan bimrim, yan bigrim doza we gîyan
Ko ez şehîd bim ji bo welatê xwe
Li ser min megrîn ka feqîrê me

Hevalê min hevalê doza minin
Hevalê min hevalê rêça minin
Hevalê min hevalê gelê minin

13.8.1980

## HEVALAN SIR NEDA DIJMIN

Îro serê Kurdistanê dijwar û zore
Pir rivîyan derva kes nabên dore
Şoreşger zindanada dimrin darin
Gelekan doz berdan dibên pir zore

Conta hate serî tev berdan Welat
Ka xwasteka we bû ew doza Welat
Gel li ser çîyan pir têne kuştin
Wan berda welat kê çibikin xebat

Heval hevalê karkir û gundîne
Ne zirtone, ne pîsin û ne solcîne
Lêdan, lêxistin sir nedan dijmin
Hevalê min dijî xwûnxwaran gîne

Bawerîya hevalan bi qata bin dest
Xwandane, zanane lê şerê zor dest
Soz didim hevalan xebat geş bikim
Hinber dijminan em bibin yek dest

Lê sebe hevalan xew nê çavê min
Heval bûne pola li hinber dijmin
Em pîsîyê û qereşîyê çekin ji ser xwe
Destê Feqîr bin dijmin derxînin

27.3.1970

## Belengazîya Filistîn

Birçî , tazî lê pûk û baran
Nan digerim wek gurê çolan
Li ser çîyan,fehîdan û çeman
Bi şewat digerim li nane zikan

Derkete pêşmin refekî kewan
Dil duxwaze buxwum goşte wan
Gavek û dudu ez diçûme peş
Jor diketin ez mam li çolan

Ketim ji kefteke dibû gure hur
Mar, mişk û kêziken pire hûr
Paşva vegeriyam derî wenda kir
haho dirivim ji keft pire kûr

Maran û mişkan zor dane ser min
Dikime qîrîn şewqek ne peş min
Haho û şîqîn li derî digerim
Ji derî ji kefte derket lingê min

Ji keftê derketim dengekî dijwar
Zûrîyan, qûrîyan hirç û gurên har
Tirsîyam û xwof tev kete dilê min
Xwe çito xelaskim ji va hovê har

Meşîyam rivîyam li çolan tazî
Rêwiyak li pêş min çito dibezî
Min bankir haho qîrîn û gazî
Diçime filistîn ji min dixwazî

Min go dixwazî bi hevale tebim
Tu nanek bi mide ez li cem tebim
Awurek da min wegere law law
Ko Nanê min heba ez çima wabim

Rivîya ji ber min xwe xelas nekir
vegerîya paşva tufe feqîr kir
Paqişkir rûçuk çavê xwe vekir
Xortê filistîn dîsa wenda kir

25.1.1983

## HEJA Û ZANA

------------

Hêja û zanayê Kurdan
Berxedarbî Cîgerxwûn
Gelê Kurdistan tev da
Silav dane Cîgerxwûn

Li ser çîyayê Kurdistan
Keç û xortan girt dilan
Def û zirne deng da hev
dibû govend Cîgerxwûn

Bûkan xwe ser tevnê
Keşk ri li bejinê
Bevşê xwe kirin destan
Go bibêje Cîgerxwûn

Şivanan pez şevîn kir
Cotkaran xeta xwe kir
Dengê gavan û cot kar
Dibên hozan Cîgerxwûn

Mêrên Kurdan li odan
Le bigene Kurdistan
Ew pêşmergên qehreman
Silav li wan Cigerxwûn

Sala berê pir kesan
Dîrok didan ser destan
pirîyan xwad û guhdar bû
Bi xemgîn ra Cîgerxwûn

Sala çûyî li Kurdistan
Gelê me bi te hisîyan
Silavê dil germ şandin
Ji hostan ra Cîgerxwûn

Pir nivis û nivis kar
Xwe kirin ronayî û dar
Va çîroka Kurdistan
Bi teyran û Cîgerxwûn

Le nivis kare Kurdan
Li dîrok nebûn xwudan
Rê şaş kirin ber gelî
Ew nasnakin Cîgerxwûn

Hezar sal bû bê dîrok
Pir dibêjin ez serok
Va çîroka kurdistan
Meran derxist Cîgerxwûn

Ew dîroka me kevnar
Nujen derket ser dîwar
Bi mîlyonan xebatkar
Mirin seba Kurdistan

Tev ketî nav dîrokê
Ko bistînin dehokê
Şaristanê Kurdistan
Bi Bêsîkçî Cîgerxwûn

Ew Cîgerxwûn bi Hêjar
Namirin xwane û teyran
Xeber gihişt dile wan
Ser bilindî Cîgerxwûn

Şex-mehmûdê-berzancî
Eli-şêr û şew-wancî
Seyîd-riza û Şêx-sayîd
Ew namirin Cîgerxwûn

Kadî-muhemed û Berzanî
Te navê wan tev danî
Ji Medya heta bi îro
Ji bîr nabin Cîgerxwûn

Ez Feqîrê me Kurdan
Silav dikim pir kesan
Xebat û lebata we tev
Kurdistanra Cîgerxwûn

16.4.1984

## ÇUME LEVE

Ez çûm mala xwe
Min dî dayîka xwe
Yara min li vir
Kete reçika xwe

Min dest lê rakir
We xwe li bakir
Kete dilê min
Mejî kevnar kir

Min dî li ser cem
Di pez da xizêm
Ew pir lewed bû
Çûme lev û dem

Destê xwe rakir
Bi min ra li bakir
Go lawo bi sek
Hustê min xarkir

Go ezda li vir
Lê tu neyî vir
Min go çima wa
Go here ji vir

Çavê we reş bûn
Dema xwe xweş bûn
Bejine lewend bû
Gulê we mor bûn

Navê we pirskir
Lêvê xwe gez kir
Wê awur da min
Dilê min kul kir

Bejina xwe li bakir
Dem li min sar kir
Ez kirim quloç
Evîn li min barkir

Min ew winda kir
Dinê li min ar kir
Feqîr û girîyam
Çav li min ser kir

Ez çûm malka xwe
Min go bavkê xwe
Go lawê min bisek
Ew ne milkê me

25.4.89

SINGE BI PIRÇ

Ez ban dikim xortê malê
Dijminan bir dotmama te
Çek û bomban hilde milan
Were pêşîya dijminê xwe

Ez Kurdistanim bi navim
Pirî bi deyîşt û bi av im
Dijminê te lê ez girt im
Ez li hêvîya te tim saxim

Ko rastî tu min duxwazî
Wekî mêran tu bide soz
Eze pir li hêvîya te bim
Ko tu tim bikî kar û doz

Tu bi derewî mede sozan
Ko xwe bikî hêz û rêzan
Gelî tev bide dora xwe
Rakî ser ling qata xizan

Lê ko tu nekî ceng û şer
Sîngê bi pirç tu nedî ber
Zo çiçikê min sêvê sor
Xwe nikanî tim bidî ser

Tu û dijmin tim bikin ceng
Erdê li wana tev bikî teng
Tu min ji dijmin bistînî
Ko tu li dinê tim bidî deng

Lê tu hidî bi deng û navî
Rabê îro tu min duxwazî
Ez çeleng û rinda te me
De were ser min tu bazî

Feqîr heza min tim ji te
Ez dilê xwe tev didim te
Kesk, zer û sor li min kî
Xwe bikim tev hembêza te

2.5.1974

## CEJNA KURDISTAN

Lê em rabin ser lingan
Tim çekan hildin milan
Bi tektîk û bi zanistî
Tev bistînin Kurdistan

Werin cejna me Kurdan
Agir berdan serê çîyan
Dinê tev bû kesk û sor
Umur didê Kurdan gîyan

Tev amar kin Kurdistan
Çêkin li nav Kardistan
Hûn û Feqîr herine pêş
Ko şên bikin Kurdistan

Nuroj cejna me Kurdan
Keçan dest dida xortan
Def û zirnê kir govend
Dengê xwe da Kurdistan

25.4.1989

## P A R T I Y A

Pêta agir li Kurdistan
Averû bikin serî çîyan
Rêxne kirin mafê gîyan
Tu kes nabên va a wan
Iro û bi siba nê gotin
Yan rizgarî yan mirin
Azîn deyînin li Kurdistan

Ko welat tev ron bibê
Ol ji ser gel çe bibê
Menceseran bavên jor
Ur li dijmin der dibê
Nisax nebên tu însan
Idî kes nebên werga
Sîstem dibê a gundî
Talîye zeft û geftê pir
İcar nebê mal û milk

Ko em bikin cenga xwe
Urf û edet bi gelê xwe
Recetan gavan çê bikin
Dermên bibînin bi xwe
Idî bawer bikin gel
Suruç Feqîr da dinê
Tuştê nuh û baş çekin
Aborîya xwe bilind kin
Nezanê ji nav xwe rakin 20.6.82

## XEML û XEZ.

----------.

Keçê heza min ji teye. Delalê delalê delala min.
Li dinê mezin boyê. Sebirê çanê tu mala min.
Pir yeke poz bilinde. Kevokê şîrînê tu konê min.
Diçê bajar tev gunde. Xeml, xêz û tu milkê min.

Te nebînim ez bimrim. Şebabê şîrînê tu milkê min.
Ez berê bi derd û kulim. Kevokê, rindê tu jîna min.
Va çi kule ji min ra hat. Derdo, derdo milkê min.
Tirsim gewrê nebînim. Li min li min halê min.

Ew kulîlka ser banan. Min ew bînkir bi salam.
Dest û ling tev girêdan. Haho, haho milkê min.
Xwe benda bedena min. Keçê rindê Kurdistan.
Serda hêsin bera dan. Derdo, derdo milkê min.

Lê bi çûk bûm bê jîn bûm. Tu ber malîya mala min.
Li mezebotan mezin bûm. Tu evîna dilê min.
Gava can li men hêşîya. Derdo li min halê min.
Hêsir çavê te weşîyan. Gewrê, rindê tu milkê min.

Min dît havîn zivistan. Bimrim, rabim halê min.
Axan em dan bin destan. Li min, haho warê min.
Va feqîr ra kê bimrê. Dilo, dilo û dilê min.
Navê yara min Kurdistan. Lê xeml û xêza mala min.

12.8.1976

## ŞERME GELE KURDISTAN

Şerme gelê Kurdistan
Li dora xwe binêrin, binêrin, binêrin
Dinê xwe xelas dikê
Çi li neyînûkê dinêrin, dinêrin, dinêrin

Dem a paş deh û heftan
Xebat kete nav gundan
Belengaz, karkir cotkar
Li Kurdistan binêrin, binêrin, binêrin

Jin û mêran tev rabin
Bi gelê Welat şahbin
Jîr û miştiman perwer
Werin tev rabin, rabin de rabin rabin

Xwe dest dijmin mexînin
Lê gelê dinê bibînin
Dijmin ketê warê mê lo
Sîngê wanda lê xînin, lêxînin, lêxînin

Bi jîranî deng bikin
Wekî mêran şer bikin
Bane gelê dinê kin
Alîkarîya me bikin, bikin, bikin, bikin

Em tev li axan xînin
Malê wan ji wan bistînin
Bidin bi gurlê û bomba
Hinber dijmin, derxînin, derxînin wan wan

Serê çîyan dest xwe kin
Gelî li wir kom bikin
Bi tevger û hêza gir
Cengê bi dijmin ra bikin, bikin bikin

Pir bikujin lê bimirin
Em Kurdistan bistînin
Ala Feqîr bi çar rengan
Bi ser xweda dar xînin, dar xînin dar xînin

25.1.1978

## XER Û BERA KURDISTAN

Eme bi mal bûn milk bûn
Bi konê hical û perd bûn
Deşt, zinar, çîya û zozan bûn
Egît, navdar û pêlewan bûn
Xwudan çîrok û tevda dîrok bûn
Xwudan dewlet, xwudan milet bûn
Li şûna med bûn kurê ferhed bûn
Berayê şêrgo bûn şûr û gurz bûn
Hiwêzê çav kildayî dest meda bûn
Kî dihat ser me derba xwe didît
Xwudan kerîbûn xortê me hebûn
Hinir û zana pir li ser xwe bûn
Keç û bûkê me tevda li bêrîyê
Li mêrg û serhedan pez didotin
Di dewleta meda ew deşta mûşê
Tutunê bi bîn xortan dikşandin
Keç û bûkan bi xemil û xêzbûn
Serî bi tac bûn enî bi zêr bûn
Keras û xeftan ser xweda berdidan
Rişme û kemer li xwe diştandin
Biskê delal gulê wan mor bûn
Rihan û bînê tev ji wan dihat
Tev rê diketin duçûne bêrîyê
Dest didane hev wekî kulîlkan

Li serê zozanan kerî dajotin
Li ser mihînan xortê me ciwan
Simêlê reş bûn tev bi huwêzî
Ber piştê wanda şêşxane û şeşar
Bi ser bêranda kerî hildidan
Li deşta berêz pir xort û keçan
Di ketin govend dikirin dîlan
Pirî egît bûn lê pêlewan bûn
Konê mezin bi hical û perde
Gumgumê qehwê tev dikir guminî
Egît siwar dibûn ser piştê hespan
Li ser seglawîyan cirît dilîstin
Bi dengê dîkan gavan û cotkar
Keçê por zerî meşkê xwe hildidan
Li serê zozanan xortê qenc û baş
Kecikê delal qalê wan dikirin
Bûkek derdiket şênayî û şadî
Tev diteqandin şêşxane û şeşar
Destê hev digirtin tev dibû dîlan
Ew roja şadîyê tev roja gulan
Keçikê por zer xortê simêl reş
Dest didane hev lê dibû govend
Gewr, zer û sor li ba diket tev
Werganî duçû talîya payîzê
Zivistan dihat tev dibû hirmiz
Xortê mê ciwan pirtûk dixwandin
Nivis dikirin bi kelem û divît
Li ser pirtûkan pir mijûl dibûn
Dîrok çap kirin em tev rojhilat

Dîcle û firat kirin nav Welat
Çîyayê dersim tev wînê felat
Deşta meletîyê kerî diçerîyan
Xinis û Warto serê zozanan
çîyayê siwêrek pir riza sipî
Bi goştê emilkan ava serhedan
Li serê xalîyan doşegê xerzê
Belgê qedîfê didan ber milan
Qelûna mezin tutûna bi bîn
Didane ser lêvan dûxan berdidan
Kelam digotin xortê pir ciwan
Guh dar dibûn keçê bejin zirav
Bisik berdidan ser henarê çavan
Navê wan zirav çavê reş belek
Kenberê zêr û zîv li piştê wana
Rext û gulê mor dadiketin navê
Kal û pîrê me tevda zanabûn
Rojek hat ba ew bayê ba kur
Pêra avêtin berf û tev zîpik
Pûk û baran tev dibû serma
Li hev hewilî gund û şênayî
roj li me reş bû pir jî tarî bû
Tar û mar bû gund tevda şênayî
Serma kêm dibû rabûme ser xwe
Bi herdû çavan nihêrî li dor xwe
Bajar û gund tevda hilveşîyan
Hindikî rûniştim ketim ramanîyan
Rabûme ser xwe ez tevda girîyam

Bav, bira, dayîk û xwûşk li kur man
Kete guhê min dengekî dijwar
Li pêşa xwe nihêrî bira dirivîyan
Gotin xwe pêgî lê dayîk birin
War û milkê me tev talan kirin
Şîqînî bi min ket lê rivîyame ser
Bav û biran xwe dan hinber
Lê xelkan dayîka me bir
Mejî kirin kole û nav ber
Dayîk ji wanra em girêdan
Tev ketin nav kul û derdan
Çi talan bû ji mera hat
Ez, xwûşk û biran girîyan
Lê hemû bûn wekî mirîyan
Kalê bavê hat sekinî
Go dayîka we gulî hûnan
Ko em hemû rabin ser xwe
Bê hiş gerîyan li dayîka xwe
Hêz û taqet di meda nema
Dijmin danî ser serê me
Ji me distand ew mal û milk
Nema singê konê me hilkir
Ware mebû dijmin li ser war
Em bûne kolê kolê dar
Va koledar pirî dijwar
Bi qirbacar dibirin kar
Xebata me bi dest û lingan
Bi zor mafê me tev duxwar

-201-

Ezî salek û dududîyan gir bûm
Birangê min hîne hurbûn
Dijmin lawê xalê me hanîn
Li ser me ew wezîr danîn
Min go tu lawê xalê min
Wî got lê tu xulamê min
Min go ma qe wanî dibê
Got ez axe tu xulamî
Min go ez vê qebûl nakim
Çû leşkerê dijmin hanî
Danîn erdê li feqîr xistin
Mêjê serê min tev şuştin

# Bijî Kurdistan

## Selîm FERAT

(Helbestên Kurdî)

Derket

---

# Dîwana Reş II

## Feqîr AHMED

(Helbestên Kurdî)

Derdikeve

Navnîşan:
Weşanên Kurdistan
Wachsbleiche 62
D-4500 Osnabrück